


## Daye Dayrak

Xatun Dayrak ku bi Rezbar jî tê zanîn û nasîn jineke kurd a ji êla Caf e. Ew di sedsala heftan a hicrî de jiyaye. Di serdema xwe de yek ji wan jinên pêşeng a civaka kurd a li herêma Kirmaşanê ye... ***Zehra Mohammedzadeh / R.2***



## Zivistan û cimetên berê

Zivistana Qersê hêdî hêdî rûyê xwe nîşan da. Belekiyên berfê daketine çiyan. Zivistan niha jî tivdarekê gund û bajaran dike, lê gundî û bajariyan ji bo pêşwaziyê tivdarekên wê qedandine. Barên êr û kartolan dane ser hev... ***Ayhan Erkmen / R.8***



## Veganîzm ne çi ye?

Ger mirov veganîzmê bi tenê xwarin û vexwarinê ve sînordar bike, wê demê em ê nikaribin aliyên wê yên exlaqî û polîtîk bibînin û dê ji rastiya xwe û ji felsefeya jiyanê dûr bikeve. Veganîzm şêweyekî xwarin û vexwarinê nîn e... ***Gulan Morî / R.12***


# xwebûn

7-13 KANÛN 2020 HEJMAR: 51 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org


# Encama qonaxa yekemîn; helwesta neteweyî



Şandeya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) di 20'ê mijdarê de bi boneya aloziya di navbera hêzên kurdî de bi rêya diyalogê were çareserkirin, dest bi hevdîtinan kiribû. Endama KNK'ê Asya Abdullah têkildarî hevdîtinan ji rojnameyê me re axivî û wiha got: “Li başûr hemû aliyên me bi wan re hevdîtin kiriye rewşê jî dişopînin û piştgiriyek xurt dan xebatên şandeyê. Nêrînên wan jî ligel nêrîna şandeyê bûn. Noqteyên hevbeş ên esasî ew bûn ku bi tu şêweyî şerê navxweyî yê di nav kurdan de dernekeve. Pirsgirêkên heyî kurd xwe bi xwe bi rêya diyalogê çareser bikin.”... ***R.6***

KAMO

### Dişemenê kurdan ra dost nêbeno... ***R.9***

# Ev çawa dibe ‘biqisûr’?



Li Colemergê zarokê 16 salî Ozcan Erbaş bi guleya leşkeran hat kuştin. Walî hewl dide bûyerê berevajî bike. Geh dibêje leşkeran gule berî hewayê dane û geh dibêje ‘kuştina biqisûr’ lê heta niha tu leşkerek nehatiye girtin. Endamê Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) û parêzer Eren Baskin wiha got: “Ev yek çawa dibe ‘biqisûr?’ Nava rojê saet li 3’yan û bi mesafeya 500 metre zarokek ji pişta xwe bi guleyê tê kuştin.”... ***R.3***

## Malbatan piştgirî da grevê

Girtiyên li girtîgehên bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyêyê ji doza PKK'ê û PAJK'ê girtî ne, li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan di 27'ê Mijdarê de çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger dan destpêkirin. Malbatên girtiyan ji bo daxwazên girtiyan bên qebûlkirin destnîşan kirin ku heke daxwazên zarokên wan neyên qebûlkirin, wê li ber deriyê girtîgehan kon vedin û ew jî wê bikevin greva birçîbûnê. Yesûre Tûfan ku kurê wê Azîz Tûfan di Girtîgeha Jimare 1 a Amedê de ye, diyar kir ku daxwazên zarokên wan daxwazên wan in.. ***R.3***

## Welatekî azad lê bêziman!

Li Kurdistanê, heta rizgariya ziman pêk neyê, hîyeraşiya di navbera tirkî û kurdî de neyê hilweşandin, bêedaletiya civakî-aborî ya li ser vê hiyerarşiyê bilind dibe ji holê neyê rakirin em nikarin qala "neteweya kurd" û "rizgariya neteweyî" bikin. Kolonyalîzma ziman ji bo gelê kurd ji kolonyalîzma siyasî û leşkerî girantir e. Zincîrên vê koletiya modern ewqas giran in ku heta niha ji bo şikandina wan hewldanek jî nehatiye dayîn. Bi riya naskirin û statuyekê yan bi riya serxwebûnê meseleya axê dikare bê çareserkirin. Digel vê, wê hîn jî dest û lingên gelê kurd bi zincîrên koletiya ziman girêdayî be. Her milet di dîroka xwe de dikare carekê bibe xwedî şensê têkoşîna rizgariya neteweyî. Eger ev proseya avakirinê serfiraz be, neteweyek bi ziman wê pêk were... ***Necat Ayaz / R.8***



*Wekî pezkoviyeke çeleng dibeze*

*Zarokên Rojava yên di nav sanciyên şoreşê de çavên xwe li cîhanê vekirin, hînê pir rê û rêbazên şer, berxwedanî û parastinê bûn. Zarokên dibistanên xwe dixwînin û perwerdeyê dibînin, di dema vegera malê de piştî ku ew karê malê xilas dikin, li kolanê û bi zarokên cîranan û hawirdorê re, dest bi lîstokan dikin...* ***Sorgul Şêxo / R.2***

## Bila derzî bêpere be

Li cîhanê heta niha bi milyonan mirov bi vê nexweşiyê ketine û ji roja nexweşî belav bûye heta îro, dezenfektan û maske dihatin firotin û vê yekê bi xwe re rewşên aborî yên giran dianîn û hê jî tîne. Niha jî mijara kirînûfirotina aşiyê di rojeva cîhanê de ye. Hefteya borî li Ewropayê ji bo ku derziya dijî Kovîd-19'ê 'bêpere be û her kes bikaribe xwe bigihînê' 10 tevgerên cuda kampanyaya îmzeyan dan destpêkirin. Heta dawiya sala 2021'ê hedef milyonek îmze ye. Li Fransayê komîteyeke ku ji dehan komele, sendîka, partiyan pêk tê piştgirî da kampanyayê. ***R.7***

## Teknolojî û kurd

Peyva teknolojiyê vê gavê gelekî populer e. Kesek çawa her roj li ser û çavên xwe mêze dike, an jî cil û bergên cuda xwe dike, alavên teknolojiyê jî wisa bi kar tîne. Mebest erka (herk) wê alavê nîn e. Ya pêwîst îmaja wê, hêmana wê û xwedaniya rola wê ye. Çawa berê dê, bav, xwişk û birayên me xemlên cihêreng bi kar dinanîn. Ji gustîl, bazin, moriyan haya gerdeniyan cure bi cure xemil an jî berhemên wê ve eleqedar dibûn. Niha jî berhemên teknolojiyê yên populer hene, lê belê kîjan dibe bila bibe berhemên dibin bersiva pêdiviyan an jî yên xemlên kêfxweşiyê... ***Ehmed Pelda / R.7***

## Kêla Memê

Li vî warî her çiya, zinar, geliyek dîrok û xwezaya xwe di navê xwe de pênase dike. Çîroka Kêla Memê jî yek ji van e. Mem, şivanekî çeleng, bejinbilind, lihevhatî ye. Her êvara payîzê pezê xwe ji alincê radike û berê wî dide vî çiyayî. Kî dizane belkî jî çiya bang dike bi zimanê ku her kes nabihîze. Bêrîvanên vî warî, bejn û bala wan, esilzadebûna wan ji xemla wan diteyise. Mem dil berdide bêrîvanekê. Dil û awirên her duyan li hev dialiqe. Li vî welatî evîn bi çavan tê jiyîn, zêde bi gotina nayê ziman... ***Mem Avba / R.5***



## Hay ji xwe hebî têyî cezakirin

Dadgeha dewleta tirk li gel ku îfadeya kesê ku der barê nivîskar Gulgeş Deryaspî de îfade daye ne rast in lê dîsa jî 6 sal û 3 meh ceza li Deryaspî birî. Nivîskar pirsên rojnameya me bersivand û diyar kir ku çi rojnameger bî, çi nivîskar, çi siyasetmedar û hwd ferq nake yên haya wan ji neteweya wan hebe teqez tê cezakirin... ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4***

## Du hevalên Evdalê Zeynikê: Feqiyê Qizqapanê û Ferîkê Kor

Çawa tê behskirin, sê merivên paşê bijare bûne. Yek şeneyê wî (tehsîldar) Mihemedê Horê, rûspî û şêwirmendê wî Dêlê Hoko û dengbêjê wî Feqiyê Qizqapanê... Rojeke havînê, danê nîvro li gundê Koçeriyê (girêdayî Elcewazê ye) yê devê behra Wanê Kor Huseyîn Paşayê Heyderî li ser kaloriya xwe ya bi tek, xwe dirêj kiriye û dengbêjê wî Feqiyê Qizqapanê jî jê re kilaman dibêje. Wexta paşa di xew re diçe û çavên xwe digire, paşa mîna zarekî bêşikê ji nişka ve çavên xwe vedike û yaneyan li Feqî dinhêre. Feqî jî careke din dest bi kilamê dike û paşa dikeve xeweke giran. Tê gotin ku heya Feqî kilam negota xewa paşê nedihat. Vê yekê jî rûspiyê paşê Dêlê Hoko dibêje... ***Sedat Ulugana / R.8***

# Wekî pezkoviyekê dibeze...



Sorgul Şêxo

Zarokên Rojava ku di nav sanciyên şoreşê de çavên xwe li cîhanê vekirin, hînê pir rê û rêbazên şer, berxwedanî û parastinê bûn. Zarokên dibistanên xwe dixwînin û perwerdeyê dibînin, di dema vegera malê de piştî ku ew karê malê xilas dikin, li kolanê û bi zarokên cîranan û hawirdorê re, dest bi lîstokan dikin. Lîstokên zarokên Rojava û yên di nav şer de mezin dibin, cuda ne ji herêmên aram ên guleyek jî li wan nehatiye teqandin. Zarok li çi bihizirin wê di lîstokên xwe de nîşan didin.

Dema mirov li kolanan dimeşe, bandora şer û şoreşê ya li ser zarokan dibîne. Çima ez vê dibêjim? Ji ber, zarok pêwîstiya wan bi hawirdoreke aram û xwezayeke baş heye ku pêre bijîn; li ser xewn û xeyalên xwe bifikirin, da ku di jiyana xwe de çi li dibistan û zanîngehê be pêk bînin. Zarok kêfxweşiya jiyanê ne, her wiha xala gihandina civakan bi hev re û avakirina pêşerojê ne.

Li bakur û rojhilatê Sûriyeyê taybet li herêmên Til Temir û Eyn Îsayê ku herî zêde bi êrîşan re rû bi rû dimînin, gelek çîrokên sivîlên li ber xwe didin hene. Ji jinên ducanî, zarokên yekrojî, pîr û kalên ku li ruxmî nexweşiyên cur bi cur bi wan re hene, li ber xwe didin. Berxwedan wekî bingeheke sereke ya li dijî dagirkeran ji xwe re hilbijartine. Li xeta agir zarok li dibistanan perwerdeya xwe dibînin û dîroka xwe dixwînin û li hember dagirkeriyê dibêjin; çeka me ya bingehîn a li dijî dagirkeriyê zanista me ye.

Li vir ez dixwazim balê bikişînim ser çîrokeke ku ez rastî wê hatim, bi we re parve bikim. Li gundê Um El-Kêf ê 2 km dûrî rojavayê navçeya Til Temirê ye, ji salekê zêdetir e bi êrîş û topbarana dagirkeran re rû bi rû ye. Li gundê zarokeke 9 salî heye, navê wê Buşra Mihemed û ereb e. Buşra ya ji ber êrîşan ji dibistana xwe qut bûye, her roj dema ku balafirên şer û yên keşfê yên bêmirov derdikevin, dibeze kolanê û bi hevalên xwe re dilîze.

Her roj dema ku dengê balafiran tê Buşra dibeze kolanê û bi hevalên xwe re dilîze; govendê digerîne û bi lîstokên cur bi cur dilîzin. Rojekê, bala dayika Buşra dikişîne ku her wexta dengê balafirê tê, keça wê dertê derve û dilîze! Dayika wê rojekê jê dipirse: "Keça min dema balafir tên tu çima dibezî derve?" Dayik texmîn dike ku wê Buşra wiha bersiva wê bide: "Ez nizanim, dibe ku ji ber ez ditirsim" lê Buşra bersiveke cuda didê û dibêje: "Yadê ji bo balafir li mala me nexin, tu û xwişkên min û hevalên min nemirin." Dayik şaş dimîne û dîsa dipirse dibêje çawa? Buşra wiha bersiv didê: "Ez dibezim û bi hevalên xwe re dilîzim, da ku balafir me bibînin û gunehê wan bi me were û vir bombebaran neke."

Li ser vê rewşê heya niha Buşra ji ber ku dibistana wê li beramberî gundên dagirkirî girtiye, naçe dibistanê lê dema ku dengê balafirê dibihîze dibeze kolanê. Wekî vê û bi dehan çîrokên zarokan û jinan hene ku bi çi rê û rêbazî li hemberî dagirkeriyê li ber xwe didin. Zarokên Rojava ew zarokên bi temenê xwe biçûk in û bi ramanên xwe mezin in, pir kûr dihizirin û dixwazin bibin bendavek li hemberî dagirkeriya ku li ser hebûna wan xetere ye.

Zarokên Rojava barê ji xwe girantir rakirine, bi wê ramanê li ber xwe didin û ev berxwedana xwe hînê nifşên nû dikin. Zarokên ku bi şoreşê re mezin dibin, hişmendî û hizirîna wan pir cuda ye. Dayik di dema hûnandina keziyên wan yên gulîmor de, gelek çîrokên kurdan ên bi êş û kêfxweşî vedibêjin, lewra zarok jî li gorî wan çîrokan serpêhatî û pêşeroja xwe xeyal dikin.



# Rihîme û kela şîr

Derya Ozdemîr

Bervaneka bi keş keş a reş ber bi pişta xwe ve kir û beroşa şîrê xwe da ser kuçêkê êrgûn. Sergîn û tersilê ber êrgûnê da bin beroşê û hinek pûş jî avête ser û çû mala cîranê xwe arê xwe anî da ser pûşê xwe, heya ar anî destê wê şewitand. Destê xwe kir devê xwe û bi lez hinek pûşê din jî bera avêt ser. Pûş şewitî lê sergîn û tersil man zêdetir pûş danî ser êgir vê carê vêket.

Şemsê bi zanebûn teşta xwe ya encûran danîbû bin siya têxt. Li aliyekî encûr diqoqilandin li aliyê din serqoriya karê bûka xwe dikir, li çûn û hatina Rihîmeyê û karê wê dinêrî kêfa xwe bi bûka xwe xweş dikir, pir hez ji bejna Rihîmeyê dikir.

Xeftanê carsoyî hêşin ê gulgir li Rihîmeyê bû; bejna wê tev de rabûyî xeftanê lê ji eslê cawê wê xweşiktir xuya dibû. Şemsê di ber xwe de digot: "Xeftan û kumê wê çi qas lê tê. Nava Rihîmeya min tenik û zirav e, gustîlkê ji jor berde wê li jêr bisekine. Di gund de bûka herî xweşik a min e. Rihîmeya min bûye deqa jinan lê hîn zarî ye. Hinekî bielimiya kar jî bes bû. Şemsê dixwest karê wê jî wekî çelengiya wê bi navûdeng be û bibe kebanîyeke jêhatî.

Zarok bû Rihîme û hîn duwazdeh salî bû. Têretêr li ber destê diya xwe nemabû û ji ber ku xwişkên wê yên mezin hebûn li cem diya xwe neelimîbû kar. Neelimîbû bi şeş metro cawê lê rabe rûnê û kar bike û xeftên û bervanekê li xwe bişidîne. Ji ber kofiya bi reşî û îşkorên zîv jî nikaribû serê xwe rakira bi taybetî jî dema karek bikira. Ji xwe re digot vî soxeyî kum stuyê min şikestiye, hewarê ez nikanim ji ber rakevim!

Dest û lingên wê li hev digeriyan û di xwê de bûbû av. Wê zanibû xwesûya wê Şemsê di bin çavan re li wê û karê wê dinêre. Şîr hinekî germ bûbû lê agir dîsa vemirandibû. Çavên Rihîmeyê sor bûbûn; nefesa wê û serê wê êşiyabû êdî. Dikir û nedikir, ew agir vênediket di dû de beecîbû. Hinek pûş avêt ser Rihîmê. Careke din bi hêl û kuxik pif kir lê hîn zêdetir dû kir. Êdî Rihîmeyê pêş xwe nedidît. Careke din pif kir hêsirên çavên wê li ser rûyê wê hol dibûn. Piştî kêlîkekê agir ji nişka ve alaz da û xwe avêt rûyê Rihîmeyê alast.

Vê carê hêsirên çavên wê ne ji ber dû, ji halê xwe aciz bûbû Rihîme. Êdî xwe nikaribû bigirta, hêsirên wê li ser hinarikên sor dihatin xwarê. Roja bûbû bûk hat bîra wê. Dema ew xemilandibûn, sixmeyê sorê bûkaniyê lê kiribûn, sorka bûkê avêtibûn ser û li hespê siwar kiribûn. Digot qey ew malko dilizîn, difikirî ku ew ê bi berbûyan re here û dîsa vegere mala xwe. Temaşe û govend xelas bû, gundiyan xirêfa bûkê xwarin û belav bûn. Xwediyen Rihîmeyê jî xatir xwestin ku herin mala xwe. Rihîmeyê jî tev xemlûxêza xwe hewl da ew jî bi wan re biçe. Xwediyê wê û aliyê zavê hemû li hev nihêrîn û keniyan, gotin êdî mala te ev der e, tu nikarî bi me re werî, tu êdî zewiciyî.

Rabûn xatirê xwe ji wê xwestin û bi rê ketin. Rihîmeyê stuyê xwe şikênand û bera ber xwe da û dest bi girî kir, hêsirên wê mîna niha li ser hinarikên wê diketin. Piştî ku xwediyê wê jî çûn, xwe hîn zêdetir xerîb û terikandî hîs dikir; kela wê rabûbû nikaribû xwe bisekinanda. Ji aliyekî jî ji wan fedî dikir dixwest di hundirê xwe de bigire lê nikarîbû. Difikirî Rihîme, wê çi bikira di vê mala xelkê de! Diya wê tune bû; ne xwişk û birayên wê bûn, maleke xirexerîb bû. Hîn nû hişê wê hatibû serê wê ew ne malko bû, bûbû xwedî xwesû, xezûr û mêrekî; hîn nû fem kir ku ew bi rastî zewiciye û mêrekî wê jî heye.

Navê mêrê wê Celal bû. Carekê ji dûr ve dîtibû lê rind lê nenêrîbû, nedihat bîra wê Celal yekî çawa bû! Dîsa kela wê rabû hîn zêdetir giriya di dilê xwe de digot: "Xwezî min malko nelîsta, xwezî ez li malê bûma; ez ê çi bikim li vê derê." Dîsa digot xwezî ez li cem diya xwe bûma. Vê carê dora kelrabûnê ya şîr bû, heya Rihîmeyê paçikê bi beroşê pê rake, anî û xwe bi ser de xwar kir. Hew nihêrî kofiya xwe ya bi rişme û îşqorên zivî pê de kete şîr û kela şîr rabû, şîr rijiya, Rihîme giriya.



Zehra Mohammedzadeh

# Daye Dayrak: Dengvedana ji sedsala heftan

Xatun Dayrak ku bi Rezbar jî tê zanîn û nasîn jineke kurd a ji êla Caf e. Ew di sedsala heftan a hicrî de jiyaye. Di serdema xwe de yek ji wan jinên pêşeng ên civaka kurd ên li herêma Kirmaşanê ye.

Ew keça Husên Beg Celd e. Yek ji wan jinên ba tevan, hêja û helbestvana sedsala heftan a hicriya qemerî ye. Ew li bajarê (Helwan) Kirmaşanê tê dinyayê. Daye Dayrak hevjîna Şêx Îsa Berzenc û dayika Sultan Eshak e.

Ew di wê serdemê de bi rola pêşengtiya civak û baweriya êla xwe radibe, ji civakê re qeyd û qoralan datîne. Dayrak di vê sedsalê de bi gotin û çarikên xwe balê dikişîne ser pirsgirêk û mijarên olî, çandî, civakî û wêjeyî. Jixwe ev axaftin û gotinên wê ku em ê bidin, têr dikin ku mirov hay li rola wê ya serdema tê de jiyaye, bibe.

Di gelek cih û axaftinên wê de jixwe mirov dikare pir baş pê derxe ku di wê demê de jin jî ne kêmê zilaman di nav civakê de xwedî gotin û rol bûne: Ew di gelek gotin an jî çarikên xwe de balê dikişîne ser hebûn û rola jinê ya di nav civakê de, her wiha girîngî bi pêşengiya jina kurd a di nav ola yarî de dide.

**Di gotin, ango diyalogek xwe ya bi diya xwe re wiha dibêje:**

Ey diya min a delal, tu bi xêr hatî, ez dizanim ku bavê min çûye emrê xwedê û mamê min Hesen Beg jî temen gorî kiriye, ji mezinên êla Caf tenê tu mayî û hewce ye wek mam û bavê min vê eşîra mezin bişopînî, di navbera wan de edalet û wekheviyek rast pêk bînî.

Di vir de jî, em ji vê diyalogê pir baş dikarin derbixin ku hem Xatun Dayrak û hem diya wê xwedî bandor û rewşeke jûr de bûne ku wiha li ser mijar û pirsgirêkên eşîrê bigire, heya daketine nav her pirsgirêkeke civakî û di mijara birêvebirinê de jî xwedî gotin bûne. Di vê mijarê de bi wêrekî nîqaş kirine, ev nîqaş jî hatine tomarkirin.

**Di beytekê de Pîr Bonyamîn wiha ji Rezbar re dibêje:**

*Ey Rezbar, li gor gotina padişahê alim*
*Hin bendê xudê tên dinyayê ku cîhanê kişf bikin*
*Û wisa pê wan xweş e ku ji raza xoliqandin (xelqet) ê agah bin*
*Wê mezinê heftê û du rêberan*
*Yan jî serê heftê û du çemberê pîran wê ji wan re rê nîşan bide*
*Tiştnan bi dest wan bixwe da ku vê merhaleyê bibohirînin...*

**Rezbar di bersivê de dibêje:**

*Pîr Bonyamîn tu sera karwana qetara yarî*
*Pîrê serê qetarekê ku dikare ber hemû ferdan li peravên derya û çolan pîrî bike*
*Tu xwedî gotin û berpirsê me*
*Padişahê Perdîwer li ber mikurhatinên xwe de paybend*
*Û serê xwe spart te û tu wek pîr pejirand*
*Tu bi girêdan (paybend) bi ehd û soza xwe, xweşikiya şert digihînî asta bilindtirîn*
*Her wiha ji wî re heya sînorên yarî rêbertî dikî...*

Xatun Dayrak; ew belkî dayika Sultan bû lê belê di heman demê de berpirs û pêşenga yaran û seroka civaka jinên yarsan bû.

Ji Xatun Dayrak ku bi leqeba Rezbar jî pir baş tê nasîn, hejmarek zêde helbest mane. Her wekî ji helbestên wê jî tê fêmkirin, ew helbestvana hezkirin û hikmeta xwedê bû. Ji ber ku li gor wê, jiyan di mirinê de û bereket û bextewarî jî di hewldan û lêgerînê de ye. Wê demê hewce ye di rêya hezkirinê de perde û astengî bên rakirin û mirov xwe bispêre destê hezkirinê. Bispêre evîna ku helac winda kir.

Qalib û hin helbestên wê li ser metha lawê wê Sultan Eshaq in. Wê muzîkek taybet daye helbestên xwe.

**Niha jî mînakek ji helbestên wê:**

*Bî qewêyê dil, bî qewêye dil*
*Azîz emrê tu bî qewêye dil*
*Her çî fermawayet qebûlen qebûl*
*We yadem mîw weşyanem meşqûl*
*Medî şahidî ez û bî moşkel*
*Ne lûh yaqut ateş qatel*
*Zûhûre dile û nûr dîwane kamil*
*Heftewan ce nûr şahbaz adel*
*Bî şert mîrdan tu kerd we hasel*
*Perî destgîrî yaran fazel*

**

**Ger em wateya wê kin û cewherî bînin ziman:**

*Ey rêberê min ê ezîz*
*Emr û fermana te bû hêz û quwet ji dilan re*
*Her tişta ku tu dibêjî me qebûl*
*Dema ku em bi fikra roja ezelê dikenin*
*Dil şîn û şa dibe*
*Ez ji wê yekê re şahidiyê dikim bêguman*
*Li nav tableta rûnî de (tebeqeya pêncan a asîman)*
*Di nav agirê dikuje de, we ronahiya dîwana bêkêmasî xuyanî kir*
*Ey mîrê rast, mebesta min ji wê ronahiyê, ronahiya heftane ye*
*Ku ji bo erêkirina peymana roja ezel, we bi havalên xwe re danî*
*Ku ew te afirand*
*Ji bo girtina rêhevalên zana û alim*

**Ev her du beytên wê jî êşare bi çîroka zal û sîmorx a di şahnameyê de dikin:**

*Min dîwana rêberê xwe danî ber siya mûmê*
*Û ez wê gavê tevî sê firişteyan dijiyam*
*Û demekê her wekî sîmorx çûm bi alîkariya rustem*

Xatun Dayrak di sedsala ku tê de jiyaye kariye bi awayek baş û xweş jinan birêxistin bike. A rast mirov dikare bibêje ku di wê demê de, yanî di sedsala 7'emîn a hîcrî de Xatun Dayrak jinên yarsan bi awayekî pir baş, li dora çanda dewlemend a wekhev û li ser zanebûnên dema tê de jiyane civaka yarî birêxistin kiriye. Di demeke wiha de xebateke wiha ya birêxistinkirinê; her wiha li dora çand û baweriya yarî jî jinan di nav civakê de bi awayekî herî baş bîne gel hev, wan birêxistin bike. Ev jî wek mîrateyeke dewlemend a jina kurd e ku heyxatuna îro hatiye parastin.

# Guleya berdidin hewayê kurdan dikuje!

**Li navçeya Rûbarokê Ozcan Erbaş ji aliyê leşkeran ve hatibû kuştin. Ji bo kuştinê veşêrin walî got ku 'qaçaxçî' ye û leşkeran gule berdane hewayê. Balkêş e kguleya berdidin hewayê kurdan dikuje**

Li gundê Bêruh ê navçeya Rûbarokê ya Colemêrgê di 30'yê mijdarê de zarokê bi navê Ozcan Erbaş ê 16 salî bi guleya leşkeran hatibû kuştin. Walîtiya Colemêrgê wek her carê dîsa xwe şaş nekir û îdia kir ku Erbaş "qaçaxçî ye" û leşkeran piştî gule berdaye hewayê jiyana xwe ji dest daye.

Şandeyak ji parêzerên Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) û Baroya Colemêrgê çûn cihê bûyerê û ji gundiyan agahî wergirtin û lêkolîn kirin. Parêzer Eren Baskin ê endamê ÎHD'ê ku di nav şandeyê de bû, têkildarî bûyerê ji nûçegihanê MA'yê Mazlûm Engîndenîz re axivî.

Eren Baskin destnîşan kir ku wan çavdêriya wê yekê kiriye ku Erbaş bi sîlehek taybet hatiye kuştin û gule li pişta wî ketiye û di pêş de derketiye. Baskin got wan bi hin şêniyên wir re hevdîtin kirine û ji hin hevalê Erbaş agahî wergirtine.

Baskin anî ziman ku kesên ji wan re axivîne gotine di ketina gund de dema ew li ser hespê bûne dengê destek sîleh bihîstine û piştre dîtine ku Erbaş ji ser hespê ketiye xwarê û wiha got: "Dema meriv ji wir li miqabil dinêre, di qadek ji 500-600 metreyî pêk tê de, gelek leşker hene. Piştî bûyerê leşker demildest guleyan berdidin hewayê. Hevalên Ozcan Erban hemû direvin. Hevalek wî dibêje 'min xwest alîkariyê bidim Ozcan lê destûr nedan. Ez jî tirsiyam. Min dizanibû Ozcan li wir hatiye kuştin. Çimkî min dît ku ji bedena wî parçe derketin'."

Baskin got ku di 40 rojên dawî de li seranserî Colemêrgê welatiyek jê ji Îranê 3 welatî hatine kuştin û 6 kes jî birîndar bûne û got: "Xelkê li herêmê vê yekê wek tehdît dibînin."

Baskin bal kişand ser daxuyaniya



Walîtiya Colemêrgê ya "leşkeran gule berdaye hewayê" û wiha got: "Ev daxuyanî rewşa giştî jî radixe ber çavan. Çimkî her tim leşker gule berdidin hewayê ango guleyek bi şaşî li yekî dikeve. Mixabin ev gule her tim rastî kurdan tê û kurdan dikuje."

Baskin destnîşan kir ku roja bûyer çêbûye 11 leşker birine navçeya Şemzînanê, îfadeyên wan girtine û piştre hatine berdan û wiha got: "Bêyî ku tu biryarên tedbîrê werin sepandin, hatine berdan. Bêyî lêkolîna li cihê bûyerê were kirin, der barê van leşkeran de 'bi qisûr kes kuştin' lêpirsîn hatiye vekirin. Me ji vê fêm nekiriye. Ev yek çawa dibe 'biqisûr?' Nava rojê saet li 3'yan û bi mesafeya 500 metre zarokek ji pişta xwe bi guleyê tê kuştin. Ev çawa dibe ku bi 'qisûr kes kuştin' doz tê vekirin. Ev li dijî aqilan e. Ev yek di hemû qedemeyên dewletê de dibe sedema bêbawerî ango bêewlehiyê. Heke ev kes neyên darizandin wê hîn bêtir kes werin kuştin û dê ev kuştin berdewam bikin."

Komîsyona Mafê Zarokan a ÎHD'ê, Peymana Mafê Zarokan a Neteweyên Yekbûyî bi bîr xist û bang kir ku peywirdarên dewletê yên destê wan di mirina Ozcan Erbaş ê 16 salî de heye, bên tespîtkirin û der barê wan de lêpirsîn bê destpêkirin. ***COLEMÊRG***

## Li Colemêrgê polîs du kes birîndar kirin

Li kolana Bûlvarê ya Colemêrgê, polîsên trafîkê û 2 kes nîqaş kirine. Polîs bi çeka xwe gule berî Remzî Dûman û Metîn Oztûnç da. Dûman û Oztûnç ji lingên xwe birîndar bûn û wan bi ambulansê rakirin nexweşxaneyê. Dûman anî ziman ku dê giliyê polîs bikin.

## Li Farqînê 416 polikên zîv hatin girtin

Li navçeya Farqînê ya Amedê, 416 polikên zîv ên dema Roma û Osmaniyan ku dihat xwestin bi 400 hezar TL'î bên firotin, hatin girtin. 4 kesên dixwestin polikan bifiroşin, hatin binçavkirin. Polikên hatine desteserkirin radestî Midûriyeta Muzeya Amedê hatin kirin. ***AMED***

## Hevdîtina têkildarî 'roja ziman' sûc hat dîtin

Li Stenbolê di 26'ê mijdarê de Cîgirê Şaredarê Şîşliya Stenbolê Cîhan Yavûz û rojnamevan Kesîre Onel jî di nav de 19 kes hatibûn binçavkirin. Endama Meclisa Gelan û Baweriyan a HDK'ê Çîgdem Kiliçgul Ûçar bi boneya testa wê ya Kovîd-19'ê pozîtîf derket bi şertê kontrola edlî hat berdan. Hevdîtina Ûçar a ji bo Roja Zimanê Zikmakî ya bi zimanzan Necmiye Alpay re sûc hat dîtin û ev jî wek "endamtiya rêxistinê" delîl hat nîşandan. ***STENBOL***

## Malbatan piştgirî da grevên birçîbûnê

Girtiyên li girtîgehên bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyêyê ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, li dijî tecrîdkirina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirina mafan ên li girtîgehan di 27'ê Mijdarê de çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger dan destpêkirin.

Malbatên girtiyan ji bo daxwazên girtiyan bên qebûlkirin, destnîşan kirin ku heke daxwazên zarokên wan neyên qebûlkirin, wê li ber deriyê girtîgehan çadiran vedin û ew jî wê bikevin grevên birçîbûnê. Yesûre Tûfan a kurê wê Azîz Tûfan di Girtîgeha Jimare 1 a Amedê de ye, diyar kir ku daxwazên zarokên wan daxwazên wan in û wiha got: "Em tecrîda li ser zarokên me û birêz Abdulah Ocalan qebûl nakin. Ji ber ku zarokên me di zindanê de pir zor û zehmetiyê dikişînin, ketine greva birçîbûnê. Daxwazên zarokên me daxwazên me ne jî. Heke daxwazên wan neyên cih em ê li ber deriyê zindanan çadiran vedin û bi zarokên xwe re bikevin greva birçîbûnê. Sulhiye Sarûhan a kurê wê Mahsûn Sarûhan di Girtîgeha Tokatê ya Tîpa T'ê de dimîne jî diyar kir ku li Tirkiyeyê tu heq û hiqûq nemaye û wiha got: "Em jî li pey zarokên xwe ne, hewce bibe em ê jî bikevin grevê, hewce bibe em ê xwe bişewitînin jî. Ma ji zarokên me pêvetir tiştekî me heye." ***AMED***





Dîlan Aydin

## Di van rojên berkendal de...

*"Li heyvê dinêrim ji paceya girtîgehê/heyv bilind û ronak/girtîgeh kûr û tarî/li heyvê dinêrim.../lê heyv ji çavên min ditirse/û dibêje ev keçik şeyda ye hewarê!/ev keçik evîndar e..."* **Mizgîn Ronak**

Ev helbesta ku te beriya 15-20 salan nivîsiye; dîmenên mekanên ku ji bo we bûne qefes, dîmenên zindanên ku temenê we dixwin, jiyanê dikin dojeh (ne hewce ye ku em êdî ji niha û pê ve bi dirûşmên 'berxwedan' û 'dîlên azadiyê' vê dojehê ji nedîtî ve werin) bi hemû aliyan ve tînin ber çavên me.

Bi salan piştî nivîsîna vê helbestê jî rewş heman e, tu guherîn çênebûye, heyv jî, dar û ber jî, demsal û 'jiyan' jî ji we dûr in! Hûn hê jî evîndar in, temenê we bi hezaran bêrî û hesretan derbas dibe. Dûrbûna ji heyvê, tarîtiya girtîgehê hê jî berdewam dike. Gelo bi qasî gotina 'lê heyv ji çavên min ditirse' em jî ji çavên we bitirsiyana dê niha rewş wiha bûya? Ger ku me bi tirs li çavên we binêriya û ji bo hêvî û pêwîstiyên we hewldanên ji dil û di cih de nîşan bida hûn ê hê çendik û çend salan jî di wan dojehan de bimana?

Çavên xwe digirim te tînim bîra xwe van rojan. Dîmenê çûkeke di qefesê de yî tu! Çûkeke ku bi dehan salan e baskên wê bi têlediriyan ve asê mane. Çûkeke ku ji bo azadiyê xwe li dîwaran dixe, tî û birçiyê firînê ye. Çûkeke ku ji ax û asîman dûr, bê bask maye!

Bi roj û bi şev dîmeneke li bîra min î tu... Asêmayî, dîlgirtî û heta tu bibêjî jandar. Hemû kêfxweşî, di siya te de winda dibin... Hemû hêvî û bextewarî bêwar û navnîşan dimînin... Hemû demsal şîna dûrbûna ji te digirin. Wekî janeke zirav e ev bîra ku bi dehan salan e bê te dagirtî ye... Wekî hêviyeke pêknehatî ya xwekuştî... Wekî kêfxweşiyeke ku tu carî pêk nehatiye.

Bila goriyê te bibin hemû teorî, nav û nasnav. Bila tune bibin hemû armancên ku bûne sedema wê dîlîtiya ku ji hedê xwe zêdetir, sînorê her tiştî derbas kiriye! Bila hemû ken û kêfxweşiyên ku min bêyî te derbas kirine bibin gorî ji te re.

Her ku çavên xwe digirim, te dibînim, van rojên ku heta tu bibêjî derasayî ne. Her ku çavên xwe vedikim jî te dibînim! Dibînim lê nagihîjim te, tenê xeyaleke ku bi bêrî û hesretê xwe li rê û dîwaran dixe heye. Xeyaleke ku dibêje qey digihîje lê her diçe dibîne tenê çûyîn û hatineke ji bo gihîştinê ye... Her diçe dibîne ku di her rêwîtiyê de 'destvala' dimîne.

Van rojên ku li zoriyan zorî zêdetir dibin, li neçariyan, neçarî... Di van rojan de ku sînorê sebrê jî yê beden û derûniyê jî nemaye di çavên min de yî tu! Her tişt niha berkendal e lê tu tişt bi qasî rewşa we berkendal nîn e û hêvî jî, rastiya heyî jî di van roj û mehan de niha di cenga jiyan û mirinê de ne.

## Li Misircê erdhej: Gelek avahî hilweşiyan

Li navçeya Misircê ya Sêrtê 3'yê kanûnê, saet di 08:45'an de bi mezinahiya pileya 5.1 erdehejek çêbû. Hat gotin erdhej 5 kîlometre di kûrahiya bin erdê de çêbûye. Erdhej li Êlih, Amed, Mêrdîn, Şirnex û gelek deverên din bandora xwe nîşan da û li van deveran jî erd hejiya. Ji ber erdhejê kes nemir lê zirara madî çêbû. Nexweşxaneya Dewletê ya Misircê jî ji ber xesar dît hat valakirin. Welatiyên bajêr derketin parkan. Şandeya HDP'ê çû navçeyê û rewşa welatiyan pirsî û lêkolîn kir. ***SÊRT***

## Bombekirina Ozgur Ulkeyê şermezar kirin

Rojnameya Yenî Yaşamê, di salvegera 26'emîn a bombekirina Ozgur Ulkeyê de, li ber avahiya berê ya rojnameyê ya li Kadirgayê daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de xebatkarê rojnameyê Ersîn Yildiz ê di bûyerê de jiyana xwe ji dest dabû hat bibîranîn. Parlamenterên HDP'ê, nûnerên saziyên civakî û gelek rojnameger beşdarî bîranînê bûn. Gerînendeyê Giştî yê Rojnameya Yenî Yaşamê Ferhat Çelîk wiha got: "Em li vê derê ne. Li ku derê rastî bê veşartin em li wê derê ne. Karê me ew e, em wê rastiyê derbixin holê." ***STENBOL***

## Di meha mijdarê de 30 jin hatin qetilkirin

JinNews'ê çeteleya tundiyê ya meha mijdarê ku ji nûçeyên çapemeniyê amade kirine, di meha mijdarê de zilaman herî kêm 30 jin kuştine. Li gorî nûçeyê; her meh hejmara qetilkirina jinan zêde dibe û rayedarên hikûmetê jî li dewsa ku li ser polîtîkayên bêcezahiştinê bisekinin di bernameyên beşdar dibin de têkoşîna jinê hedef digirin, lê belê jin li dijî hemû zextan îsal jî derketin qadan û li dijî tundiya mêrdewletê dengê xwe bilind kirin. ***AMED***

## DFG'ê rapora meha mijdarê aşkera kir

Li Tirkiye û Kurdistanê zextên li rojnamegeran roj bi roj zêdetir dibin. Komeleya Rojnamevanan a Dîcle Firatê (DFG) rapora meha mijdarê ya der barê binpêkirina mafê rojnamevanan de aşkera kir. Li gorî rapora DFG'ê hat diyarkirin ku 8 rojnamevan hatine binçavkirin, 2 rojnamevan hatine girtin û li 5 rojnamevanan jî 20 sal û 3 meh ceza hatiye birîn. Di heman raporê de hat destnîşankirin ku niha 91 rojnameger girtî ne û darizandina 47 rojnamegeran didome. ***AMED***

## MIN Û ZAROKÊN XWE BI HEV RE ZANÎNGEH XWEND

# Bi şanoyê min dest pê kir

Rizoyê Xerzî

*Mixabin dema me amadekariya hevpeyvînê bi mêvana xwe ya vê hefteyê re dikir, di heman rojê de dadgehê 6 sal û 3 meh ceza lê birî. Tevî vê rewşa kambax jî nivîskar-romanûs Gulgeş Deriyaspî bersiv da pirsên me û ji bo em wê ji nêz ve nas bikin, me ev sohbet pê re kir.*

**Tu hîn zarokeke 4-5 salî yî, malbata te sirgûn dibe diçe Erziromê. Piştî re bi malbatî hûn vedigerin gundê xwe û dîsa sala 1994'an ji gundê Bedlîsê bar dikin diçin Tetwanê. Tu dikarî hinekî behsa çîroka vê sirgûniyê bikî?**

Bavê min li navenda Bedlîsê li taxa Zeydanê mela bû. Piştî derbeya 80'yî bavê min û gelek hevalên wî hatin sirgûnkirin. Em şandin gundê Otlu Tepa ya navçeya Erziromê. Gundê dadaşan bû me ji tirkiya wan tu tiştek fêm nedikir. Di cihê tîpa 'k'yê û 'c'yê de tîpa 'ç'yê bi kar dianîn. Mînak: çiz (kiz), çîm (kîm), hoçam (hocam)... di cihê herfa 'g'yê de jî herfa 'c'yê bi kar dianîn. Mînak: celmek (gelmek), citmek (gitmek), cormek (gormek)... bi vî aweyî zimanek cuda xeber didan. Helbet bi devoka xwe diaxivîn. Ji ber vê kesên bi tirkî jî baş bizanibûna jî dê qet ji wan fêm nekirina. Ji bo zarokek 4-5 salî têkilî her tiştî e û mixabin em heft xwişk û bira di vî halê bêhevl û hogiriyê de û bêkesiyê de bûn. Em her şev li malê dicivîn û ji bo ku vegerin welatê xwe digirîn. Herî dawî bavê min teqawit bû û em vegeriyan. Piştî salên 91-92'yan her tim li gundê me leşker hebûn û bi pêlavan ve diketin nav malên me. Çend car giliyê bavê min kirin û em aciz dikirin. Em ji gundê xwe derketin ber bi navçeya Tetwanê ve hatin.

**Tu di 15-16 saliya xwe de zewiziyî. Ji bo wê tu çi dibêjî û di vê mijarê de çi şîretên te ji bo ciwanan hene?**

Mijareke kûr e bi çend peyvan nayê gotin. Ya rast ez nezewicîm lê hatim zewicandin. Kesek ku bixwaze di jiyana xwe de 4-5 caran bizewice, bila di 14 saliya xwe de bizewice û di 20 saliya xwe de dev jê berde. Ger ne zewac karek pir giran û zehmet e karê her kesî nîn e, ji 14'an heya 90'an nikare vî barî li xwe bike. Tabî di vê mijarê de firotina jinê ya ji aliyê civakê ve hatî pesendkirin jî heye. Qelen bê standin neyê standin jina 14 be an 25 be ferq nake. Qîzek bê xwestin, zêr pê ve bê kirin, ji mal û milkê bavê xwe bê mehrûmkirin ew nabe zewac, dibe jinfirotin! Tabî gelek jinên wiha belaş hatine firotin jî hene! Em zarokên xwe bikêrnehatî dibînin û davêjin; didin mêrekî û em heta hetayê xulamtiyek qerese dikin. Yanî bi kurt û kurtasî mijareke dirêj e, ji bo heypeyvîneke rojnameyê kin bigirim çêtir e.

**Te sê zarok mezin kirine û pê re jî 3 roman nivîsîne. Her wiha te gelek salan xebatên ziman jî kirine, li saziya Kurdî-Derê. Ji me re hinekî behsa wê pêvajoyê bike; zor û zehmetî, weke jineke xwedî zarok û xebatkar, xweşî û nexweşiyên wê serdemê çi bûn?**

Ez çar salan her roj ji Bedlîsê çûm Mûşê. Çûn û hatina di wê rêya bimij û moran de romaneke qerese derdikeve. Helbet digel zehmetiyan gelek xweşiyên wê jî hebûn. A herî xweş ked dayîn û hînbûna edebiyat û zimanê kurdî kêfxweşiyeke mezin bû. Bila mij û moran, -20 pile bimîne di Mûşê de! Dema min li Kurdî-Derê dest bi hînbûnê kir, zarokên min biçûk bûn, min ew bi xwe re dibir. Di cihê seyrangehê de sazî ew pir aciz dikir. Niha li sal û rojên piştî xwe dinêrim, zehmetiyên wan rojan jî pir xweş û tije dixuyên.

**Te zanîngeh çawa xwend, ez bawer im piştî zewacê bû?**

Em bibêjin piştî pîrbûnê û mirov bibe xwedî nevîyan dê çêtir be. Helbet beriya zewacê di pazdesaliya xwe de gengaz nîn bû û wê demê di zanîngehan da beşa ziman û edebiyata kurdî tune bû. Min û zarokên xwe me bi hev re zanîngeh xwend û em ketibûm pêşbirka dê 'kî zû mezûn bibe'.

**Te sê zarok mezin kirine û pê re jî 3 roman nivîsîne. Her wiha te gelek salan xebatên ziman jî kirine, li saziya Kurdî-Derê. Ji me re hinekî behsa wê pêvajoyê bike; zor û zehmetî, weke jineke xwedî zarok û xebatkar, xweşî û nexweşiyên wê serdemê çi bûn?**

Dema min li Kurdî-Derê dest bi hînbûnê kir, zarokên min biçûk bûn, min ew bi xwe re dibirin. Di cihê seyrangehê de sazî ew pir aciz dikirin. Niha li sal û rojên piştî xwe dinêrim, zehmetiyên wan rojan jî pir xweş û tije dixuyên. Helbet hîn bûn. Tu tiştek li ser rûyê axê ji vê peyvê xweştir tune. Dema hînbûn hebe navê zehmetiyê jî diguhere. Di her tiştên zehmet de hînbûnek heye. Li Kurdî-Derê zehmetiyek tune bû, gelek tişt ez hîn bûm. Tenê em dema xwe ya heyî bikêrhatî bi kar bînin bes e.

**Piranî li vî welatî dema rojnameger an jî nivîskarek digirin, tu caran nabêjin ji ber bi kurdî nivîsiye an jî nûçeyek çêkiriye lê tiştekî din pê vedikin. Tu ji bo çi hatî girtin û derdora 8-9 mehan di girtîgehê de mayî?**

Rast e, ez jî bi aweyekî fêlkerî hatim girtin. Dema ez di girtîgehê de bûm gerîlayek birîndar jî hat girtin û li cem min bû. Digot 'polîsan qaxiz datanî ber min û digot vê destnîşan bike' û didomand digot 'min ji wan re digot ez vê kesê nas nakim çawa destnîşan bikim?' Polîsan wiha bersivandiye 'hewce nake tu nas bikî, bêje nas dikim, em bigirin bavêjin hepsê temam e' hemî mesele ev e. Çi rojnameger bî, çi nivîskar, çi siyasetmedar û hwd ferq nake yên haya wan ji neteweya wan hebe teqez tên cezakirin.

Ez ne bi tenê ji ber îfadeyekê hatim girtin ku wê kesê di axaftineke xwe de gotiye 'dozger ji min re got tu kî dixwazî bikujî, ez li pişt te me'. Ya din li ser kesan îfade daye û piştî re bi nameyê pere xwestiye ku îfadeya xwe bigeherîne. Evana me tev teslîmî dozgeriyê kir û haya wan jê hebû. Îfadeyên wî yên li ser min bi belgeyan derket holê ku sedan sed derew dike û ew kes bêewle ye lê dîsa jî vaye we dît ku dadgehê 6 sal û 3 meh ceza da min.

**Te di vê dema girtina xwe de çi nivîsand û heke bixwazî tu dikarî hinekî behsa şert û mercên girtîgehê bikî?**

Ez romanûs im. Ji bo nivîsandina romanekê şert û mercên girtîgeha ez lê, pir baş nebû. Ez zêde di girtîgehê de nemam ku romanek binivîsim. Ji ber wê xwendin û nivîsên helbestî û piranî jî li ser parastina xwe sekinîm. Girtîgeha ku ez lê dimam sedan sed azadiya kesan ji wan distand, tenê hilmek dima ji me re. Nivîsên me dicivandin, diavêtin depoyê, ber li xwendin û nivîsandinê digirt. Nameyên ku ji min re dihatin nedidan min û yên min dişandin teslîm nedikirin. Ji bo yên bi kurdî êdî werger û gelek tengasiyên dinê derdixistin.

**Çi hişt ku Gulgeş bibe nivîskar, çawa dest pê kir û bandora kê û çi bû?**


Bavê min ji xwendinê pir hez dikir û bi me dida xwandin. Îcar ji bo ku baş bi me bide xwendin, kurteya pirtûkê di dawiya xwendina pirtûkê de ji me pirs dikir û tenê ne kurte digot 'te çi jê fem kir' îcar bi bavek wiha zehmet re xwendin hêsantir dibe. Pirtûkek nediqediya yek din dianî. Bi kovara Pîneyê em hînî xwendina bi tîpên latinî bûn. Werhasil dema kesek peyvek, hevokek, pirtûkek bixwîne dê teqez fikrek dinê, çîrokek dinê di hişê wê/î de peyda bibe. Min bi şanoyê dest pê kir. Li partiyê gelek caran bername çêdibûn û a herî baş şano bû. Min şano dinivîsand û dibû lîstik, derdiket pêşberî gel dihat ecibandin. Di vir de pêwîst e ez ked û baweriya hevjînê min jî vebêjim ku wî lênûsk û pênûsê kirî anî û got 'tu dikarî roman jî binivîsî'. Qet bi dilê min nebû lê min bi pênûsa wî, lênûskê xêz kir û tariya bitav derkete holê.

**Dixwazî çi bêjî, di dawiya sohbeta me de?**

Her weha ez hê jî sax im, xebatên min didomin û dê bidomin jî. Di vê pandemiyê de niha reşnivîsa romaneke nû xêz dikim û di komîteya kovara HERD'ê de min cih girt. Niha amadekariyên wê tên kirin û heta meha adarê dê were çapkirin û bi awayê onlîne were belavkirin. Gelek xebat û bernameyên wêje û ziman hene ez beşdar dibim. Dê wiha jî bidome. Bêm girtin jî dê bidome, bêm cezakirin jî. Bi silavên germ û hezkirin...




> Li ser kesan îfade daye û piştî re bi nameyê pere xwestiye ku îfadeya xwe bigeherîne. Evana me tev teslîmê dozgeriyê kirin û haya wan jê hebû. Îfadeyên wê yên li ser min bi belgeyan derket holê ku tev derew in lê dîsa jî dadgehê 6 sal û 3 meh ceza li min birî




## Gulgeş Deryaspî kî ye?



Di sala 1978'an de li gundê Ximêçûrê yê girêdayê Bedlîsê ye hat dinyayê. Di sala 1983'yan de bavê wê sirgûnê gundekî Erziromê dibe. Di sala 1994'an de bi malbatî çûne Tetwana Bedlîsê, di 1996'an de dizewice û dayika sê zarokan e. Bi navê 'Tariya Bi Tav', 'Xezal' û 'Ez Ne Ez Im' sê roman nivîsîne. Di saziya Kurdî-Derê de rêveberî û mamostetiya dersa zimanê kurdî kiriye. Li zanîngeha Mûşê beşa ziman û edebiyata kurdî û formasyona pedagojîk xwendiye.

# Kêla Memê



Mem Avba

**Li navsera çiyê taveheyv li ser berfa pûk weke elmasekî diçirise, hindik maye ji hilatina rojê re, newaya bilûrê awazên ku sira xwe daye dest dilorîne**

Li vî warî her çiya, zinar, geliyek; dîrok û xwezaya xwe di navê xwe de pênase dike. Çîroka Kêla Memê jî yek ji van e. Mem, şivanekî çeleng, bejinbilind, lihevhatî ye. Her êvara payîzê pezê xwe ji alincê radike û berê wî dide vî çiyayî. Kî dizane belkî jî çiya bang dike bi zimanê ku her kes nabihîze. Bêrîvanên vî warî, bejn û bala wan, esilzadebûna wan ji xemla wan diteyise.

Mem dil berdide bêrîvanekê. Dil û awirên her duyan li hev dialiqin. Li vî welatî evîn bi çavan tê jiyîn, zêde bi gotina nayê ziman.

Mem û bêrîvana nazenîn jî bêyî gotinekê, dilê wan dikeve hev. Kî dizane, belkî jî ev evîn e her êvar Mem bi keriyê wî ve vedixwîne vî çiyayî.

Ji ber xêr û bêra axa vî çiyayî, keriyê Mem ji keriyên dî çêtir e. Ev rewş bala şivanên dî û gundiyan jî dikêşe. Ji mereqê zêdetir dibe weke kulekê di dilê wan de. Lê belê dikin û nakin Mem tiştekî ji wan re nabêje, weke wî çiyayî hiş dibe.

Dilê bêrîvaneke dî jî dikeve Mem. Lê belê çi dike Mem rû nadê. Reşka çavên wî yên belek her ku diçe evîna dilê xwe mezin dike. Berê evîn wiha dihat jiyîn. Dema awirên evîndar li keseke/î dî biketa, evîn, heram dibû, dihat kuştin. Evîn sêhr e, evîn efsûn e, evîn niyaz û lavaya xwedayî ye. Mem bi vê evînê dil dabû. Dilê wî niyaza evînê dikir.

Bêrîvana bersivek ji Mem negirtî, dilê wê bi agirê hesûdiyê dikele û ji temtêla Mem evîndariya wî ferq dike. Dema Mem û bêrîvana xwe tên beranberî hev, bêrîvana hesûd fêm dike ka çima Mem rû nadê. Hesûdî, nexweşiyek e ku dilê mirovan reş dike.

Mem weke her rojê, berê keriyê xwe dide deştê. Divê beriya ku roj biçe ava kerî bê ber bêriyê. Lewre evîna ew anî vî çiyayî, dîsa bi lez û bez wî û keriyê pêz tîne ber bêriyê. Bêrîvana hesûd, dikeve pey Mem ji bo kêmasiyeke wî bidest bixe. Lê heta çavê xwe digire û vedike, Mem û keriyê wî ji ber çavan winda dibin. Ev bêrîvan bi qasî hesûdiya xwe ewqas jî jîr e û fêm dike ku sireke Mem heye.

Bêrîvana hesûd, dikeve pey dek û dolaban ku vê sira wî bizanibe.

Bêrîvana hesûd, ji bêrîvana evîndara Mem sira wî fêr dibe. Evîndara dilşewat çi dizane ku bi devê xwe fermana mirina Mem mohr dike! Bêrîvana hesûd dizanî ku yê sira xwe bide, dest lawaz dibe. Lewma demildest planekê çêdike ku her kes pê bihese. Dibêje qey sira Mem aşkera bibe, dê Mem ji evîna xwe vegere û ji wê re bimîne! Diçe Kulîlkeke Guldexwîn ku tenê li navsera Kêla Memê çêdibin, dixe ber şaxê beranekî ku her kes bibîne.

Guldexwîn, guleke ji nizar hez dike, qurmê wê rojê nabîne, bi qasî nîv bejnê bilind dibe, belgên wê bi qasî tiliyekê, gulên wê bi rengê sorê xwînî û serberjêr vedibin. Mirov bi bêhna wê sermest dibe.

Mem, berê ku reşahiya êvarê bikeve erdê, weke her carê bilûra xwe ya awaz-zîz, dixe nav lêvên xwe û dilorîne. Bi newaya bilûrê, kerî fêm dike ku dema çûyînê ye. Bi zeraqên rojê yên dawî re keriyê Mem digihîje cihê bêriyê. Gundî û bêrîvan li benda Mem in ku pêz bîne, bidoşin û bixin hewşê. Dema dakirina pêz a hewşê, gundiyek Guldexwîna bi şaxê beran ve dibîne...

Çawa gundî gula bi şaxê beran ve dibîne bi matmayî gulê radike û diqîre, 'ev çawa dibe, Mem çawa kariye pezê me bibe serê wî çiyayî çêrandiye? Ne pêkan e pez bikare biçe serê wî çiyayê asê.'

Gundî bi şaşwazî li guldexwînê dinêrin. Mem, 'bêkesekî wê dera hanê bû, ev çiya nas nedikir ma!' Ti kesî zêde Mem nas nedikir. Lê comerdî, dilsoziya wî hiştibû ku her kes baweriya xwe pê bîne.

Mem bi qîrewîra gundiyan li mijarê dihese û agir bi dilê wî dikeve. Dema şewat bikeve dil, heta ew dil lê bide dişewitîne! Dilê Mem dişewite ku sira xwe daye dest! Lewma bi şerm û şewata dilê xwe ve berê xwe dide çiyê û heta navsera çiyê diçe. Mem, li çiyayê cemedîn bilûra xwe dixe nav lêvên xwe yên bikeser û pif dikê. Newaya bilûra wî ya şewat li çiya û geliyên Kato Jîrkan, Kato Marînos, Qaplanê Tenîn, Cûdiya Miraza pêkve di şikêrên wan de deng vedide.

Li navsera çiyê taveheyîv weke elmasekî diçirise li ser berfa pûk, hindik maye ji hilatina rojê re. Heta tiliyên Mem diqerisin, li ser bilûrê dilivin. Newaya bilûrê awazên ku sira xwe daye dest dilorîne...

Gundî sibehê radibin ku pezê xwe berdin, dinêrin ku ne Mem heye, ne jî pez heye. Gundî bi şaşwazî li hev dişêwirin ka çi qewimiye lê kes jê fêm nake. Li van gundan her kes pêz xweyî dike, jê fêm dike, lê tenê şopeke pêz nabînin ka bi ku ve çûye.

Keriyê pêz dikeve pey dengê efsûnî yê bilûra Mem; diçe li dora Mem dizivire û weke niyazekê wî tewaf dikin. Mîna perperokên li dora agir digerin!

Ne tenê pez bû yê bi dengê bilûra Mem ve çûyî, bêrîvana evîndar jî çûbû bûbû mêvana dildarê xwe. Mem, bêrîvana dildar û keriyê pez, di niyaza evînê de dibin kevir, sireke dîtir jî li vî çiyayî zêde dikin; da ku sir careke dîtir aşkera nebe.

Piştî gundî li bûyerê dihesin û diçin dibînin, careke dîtir li sira vî çiyayê razber dibînin û navê wî dikin "Kêla Memê". Ji wê rojê heta niha xelkê herêmê her sibeh berê xwe dide Kêla Memê û jê re niyaz dike.





Necat Ayaz

## Welatekî azad lê bêziman!

Franz Fanon di pirtûka xwe ya bi navê 'Lanetkiriyên Cîhanê' de dibêje, kolonyalîzm rêvebiriya xwe ya li ser roja îro û paşeroja welêt têr nabîne û divê teqez li ser hebûna welêt a dîrokî jî hukmê xwe bike. Lêkolînerê antî-kolonyalîst dîtinên xwe yên di vê mijarê de wisa formûle dike:

*Kolonyalîzm tenê bi kontrola xwe ya li ser miletekî û bi valakirina form û naveroka mejiyê mirov têr nabe. Bi fikreke ji vê jî xerabtir, li dîroka miletekî bindest vedigere, wê xera dike, tevlîhev dike û hildiweşîne. Ev karê bêqîmetkirina dîroka beriya dema kolonyal, îro xwedî girîngiyeke diyalektîk e.*

Fanon, rizgariya afrîkiyên bindest rasretast bi reva ji çanda serdest a ewropiyan ve girêdide û dibêje: "Eger mirovê afrîkî li kokên xwe venegere û xwe di nav gelê xwe yê ji aliyê ewropiyan ve wekî "barbar" tê binavkirin winda neke, ew nikare rizgar bibe." Her wiha, ev nivîskarê antî-kolonyalîst hişyar dike û dibêje: "Eger ev yek pêk neyê, ew ê mirov bê aso, bêreng, bêdewlet û bêkok bin û ew ê nexweşiyên psîkolojîk li wan peyda bibin."

Li gorî nivîskar, vegera li dîrokê bi riya avakirina çandeke neteweyî pêkan e û ji bo pêkhatina vê jî têkoşîna ji bo hebûna neteweyî pêwîst e. Fanon dide zanîn, di vê têkoşînê de netewe ji nû ve tê damezirandin û pê re jî çanda neteweyî derdikeve holê.

Îcar em bi vê perspektîfa Fanon a şerê li dijî kolonyalîzmê li têkoşîna kurd binêrin, em dikarin bêjin mercên ji bo çandeke neteweyî ya kurd guncaw in. Bi têkoşîneke bêeman a bi dehan salan, hemû sînorên herêmî, olî, zaravayî û civakî hatine bêwatekirin û bingeheke xurt a ji bo netewe û çanda wê derketiye holê.

Di vê xalê de mijareke din a heyatî heye ku divê bi bersiva vê pirsê bê zelalkirin:

Çandeke neteweyî ya kurd bi zimanê tirkî dikare bê afirandin?

Eger dema bersiva vê pirsê "erê" be, neteweya hîbrîd a kurdo-tirk ku niha li bajarên Kurdistanê û metropolên Tirkiyeyê rojane serkeftina xwe pîroz dike, jixwe dibe neteweya me hemûyan! Lê belê eger em bidin ser riya kevneşopa têkoşîna li dijî kolonyalîzmê, divê em bersiva "na"yê bidin vê pirsê. Li Kurdistanê, heta rizgariya ziman pêk neyê, hiyeraşiya di navbera tirkî û kurdî de neyê hilweşandin, bêdealetiya civakîaborî ya li ser vê hiyerarşiyê bilind dibe ji holê neyê rakirin, em nikarin qala "neteweya kurd" û "rizgariya neteweyî" bikin.

Kolonyalîzma ziman ji bo gelê kurd ji kolonyalîzma siyasî û leşkerî girantir e. Zincîrên vê koletiya modern ewqas giran in ku heta niha ji bo şikandina wan yek hewldanek dayîn. Bi riya naskirin û statuyekê an bi riya serxwebûnê meseleya axê dikare bê çareserkirin. Lê digel vê, wê hîn jî dest û lingên gelê kurd bi zincîrên koletiya ziman girêdayî bin.

Her milet di dîroka xwe de dikare carekê bibe xwedî şensê têkoşîna rizgariya neteweyî. Eger ev proseya avakirinê serfiraz be, neteweyek bi ziman wê pêk were. Yan na, wekî Fanon dibêje, wê neteweyeke "bêaso, bêreng û bêkok" derkeve holê.

Û bi pirseke din a ji bo her kesî em vê gotarê bi dawî bikin:

Kurdistana azad û bêziman çêtir e ji Kurdistana bindest û xwedî ziman?

Ji bo bersiva vê pirsê, divê wateya li azadiyê hatiye barkirin bê nîqaşkirin.

Lê ez di vê mijarê de zelal im. Ez welatekî xwedî statu lê bêziman naxwaz im!

# Kurd şerê navxweyî naxwazin

**Şandeya KNK'ê li başûrê Kurdistanê bi aliyên cuda re hevdîtin kirin û encama van hevdîtinan ji bo gel parve kir. Têkildarî mijarê Asya Abdullah diyar kir ku kurd şerê navxweyî naxwazin**

Navenda Nûçeyan



Şandeya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) di 20'ê mijdarê de bi boneya aloziya di navbera hêzên kurd de, bi rêya diyalogê bê çareserkirin dest bi hevdîtinan kiribû. Şandeyê li başûrê Kurdistanê heta niha bi gelek saziyên civakî û sivîl, tevgerên jinan, partî, rewşenbîr, oldar û pêkhateyên li başûrê Kurdistanê re hevdîtinên berfireh kirin. Hefteya borî şandeyê encamên hevdîtinan bi raya giştî re parve kirin û bi 'erênî' şîrove kirin.

Der barê hevdîtinên şandeyê û helwesta aliyan de, em bi endama KNK'ê Asya Abdullah re axivîn.

Asya Abdullah destnîşan kir ku wan wek şandeya KNK'ê di nav du hefteyan de bi aliyên siyasî û civakî re hevdîtin kirine û wiha got: "Ji bo nîqaşkirina aloziya heyî, ev merheleya yekem bû û em hewl didin zemîna diyalogê ava bikin û pirsgirêkê çareser bikin. Ev qonaxa yekemîn erênî bû. Ji niha şûn de dê xebat bi şiklekî din di navbera KNK û Yekitiya Parlamenterên Kurdistanê ya hevbeş de bi rêya komîteyan bên kirin. Ew ê ji bo pêşniyarên tên kirin komîsyoneke ji kes û hin aliyan pêk tê bê avakirin da ku aloziya heyî çareser bike. Dê hewldan bidomin ev qonaxa duyemîn e. Ji bo avakirina bingeha diyalogê û çareserkirina pirsgrêkan dê xebat bidomin."

**Helwest erênî ne**

Asya Abdullah der barê helwestên kesên bi wan re hevdîtin kirine de, destnîşan kir ku ji bo şerekî navxweyî dernekeve piştgiriya herî xurt dane şandeya KNK'ê û ev tişt got: "Helwestên hemû aliyên hevdîtin bi wan re hat kirin, erênî bûn û piştgiriyek xurt dan xebatên şandeyê. Di hevdîtinan de xala hevbeş a esasî ew bû ku li dijî şerekî navxweyî bûn. Divê kurd pirsgirêkên heyî xwe bi xwe bi rêya diyalogê çareser bikin. Xebata KNK'ê girîng hat dîtin."

**Başûr xwedî dîrokeke biêş e**

Abdullah di axaftina xwe de diyar kir ku bi rêya şandeyê ferq kirine ku hem li Başûr hem jî li her deverên Kurdistanê û derveyî welat gel li dijî şer e û wiha pê de çû: "Îro tu kes ne alîgirê şerê di nav kurdan de ye. Ev serdemeke wisa ye ku têkoşîna kurdan berz dibe, destkeftiyên mezin hene û divê ev destkeftî bên parastin. Li gorî şert û mercên herêmê pewîst e em bi rengekî stratejîk nêzî guhertinan bibin da ku em wek gelê kurd bikaribin di van guhertinan de pirsgirêkên xwe bi rengekî aştiyane û demokratîk çareser bikin. Aliyên din îro metirsiya dagirkeriya Tirkiyeyê li ser Başûr heye û ligel vê di navbera hikûmeta navendî ya Iraqê û hikûmeta başûrê Kurdistanê de jî krîz heye. Li hember van rewşan hê zêdetir pêwîstiya me bi hevgirtin û xebatên hevbeş heye. Kurdên herî zêde şerê navxweyî jiyane û berdêlên giran dane dîsa gelê Başûr e. Lewre gelê li vir tu carî nebûye alîgirê şerekî navxweyî. Tiştа me dît ev e. Îro civak rê nade şerekî navxweyî û ev yek jî helwesteke neteweyî ye. Hewce ye îro her du alî jî xwedî li helwesta gel û aliyên cuda derkevin û guh bidin dengê wan."

**Bila rêya diyalogê bê vekirin**

Di daxuyaniya KNK'ê ya ji bo parvekirina encamên hevdîtinan de şandeyê diyarkiribû ku heta niha jî hevdîtin bi PDK'ê re nehatine kirin. Der barê vê mijarê de jî Abdullah da zanîn ku hê jî helwesta PDK'ê nizanin û wiha domand: "Me xwest bi PDK'ê re jî hevdîtinê bikin lê hê jî bersiv nedane me. Encax ew dikarin bersiva pirsa 'çima PDK'ê hevdîtin nekir' bidin. Ya PKK'ê jî ji bo ku derfet çênebû em ligel wan hevdîtinan bikin, mesaja xwe şandin ji bo şandeyê û destnîşan kirin ku ew bi tu şêweyî ne ligel şerekî navxweyî ne. Ji bo pirsgirêkên heyî bi diyalogê çareser bibin amade ne. Di dema pêş de jî ger derfet hebe helbet dê hewldanên me ji bo hevdîtinan bidomin. Em bi hêvî ne ku her kes bi berpirsiyarî tevbigere û deriyê diyalogê vekirî bihêle. Ger, PDK jî bêje em li dijî şer in wê demê hewce ye em bi diyalogê pirsgirêkan çareser bikin."

**Berpirsiyariya neteweyî**

Endama şandeya KNK'ê Asya Abdullah di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser bandora şandeyê û wiha got: "Li başûrê Kurdistanê hêviyên gel û aliyan yek bûn. Di vê mijarê de ez dikarim bêjim bandor erênî bû. Dema armanca gel, alî û şandeyê dibe yek wê demê girîngiya mijarê jî derdikeve holê. Hatina şandeyê her kesî wek berpirsiyareke neteweyî nirxand. Di pêşniyar û xwestekên kesên me bi wan re hevdîtin kirin de, daxwaz ew bû ku hê zêde li ser amadekariya konferansekê yan jî kongreyeke bi giştî bisekine û ji bo çareserkirina pirsgirêkan û parastina destkeftiyên kurdan nêrîneke hevbeş êdî derkeve holê. Pewîst e li hemberî dagirkerî û xetereyên heyî helwesta kurdan yek be. Yanî êdî her kes di wê qeneatê de ye ku êdî hewce ye kurd xwedî nêrîn, siyaset û helwesteke hevbeş bin li hember xeterî û dagirkeriyên li ser axa Kurdistanê."

# Xwepêşandanên li başûrê Kurdistanê

Di meha mijdarê de hikûmeta Iraqê mûçeyên başûrê Kurdistanê bi sedema, Rêveberiya Herêmî ya Kurdistanê neft û dahatê radestî Iraqê nake, qut kirin. Bi qutkirina mûçeyan li başûrê Kurdistanê rewşa aborî her çû xerabtir bû. Zêdetirî 40 roj in hikûmeta başûrê Kurdistanê mûçe nekirine. Çavê hikûmetê li destê Bexdayê ye. Ev yek jî bûye sedem ku çarenûsa mûçeyên karmendan zelal nebe. Ji ber vê yekê jî karmend û mûçexwir daxwaza helwesteke giştî ji gelê Başûr dikin.



Gelê Başûr di 2'yê kanûnê de li Silêmaniyê li dijî hikûmetê û polîtîkayên wê dest bi xwepêşandanan kir. Komîteya xwepêşandanan ragihand ku biryara şoreşa sivîl dane û ji bo vê yekê jî dê rojane li deriyê Serayê çalakî bidomin. Xwepêşandanên ku gel bi girseyî tev lê bûne, tevî êrîş û mudexeleya polîsan, bi hezaran xwepêşander li ber deriyê Serayê yê Silêmaniyê çalakiyên xwe domandin û dirûşma 'hilweşandina desthilatê' avêtin.

**Parlamenter jî derb kirin**

Xwepêşandanên li Silêmaniyê yên ji welatiyan heta mamoste û karmendan ên li dijî nedayîna mûçe û rewşa aborî ya herêmê hatin lidarxistin , parlamentera Goran û parlamenterên serbixwe Sîrwan Babîn jî tev li xwepêşandanan bûbûn. Dema ku xwepêşander ber bi deriyê Serayê çûn, polîsan bi gaza îsotê û darên elektronîk êrîşî xwepêşanderan kir. Di êrîşên polîsan de rojnameger, parlamentera Şîrîn Emîn û parlamenterê serbixwe Sîrwan Babin jî hatin derbkirin.

Komîteya xwepêşandanan li ber avahiya walîtiya Silêmaniyê têkildarî aloziyan daxuyaniyek dan çapemeniyê. Komîteyê da zanîn ku hêzên ewlehiya Silêmaniyê tundî li xwepêşanderan kiriye û gelek kes birîndar bûne û hatine binçavkirin. Her wiha diyar kir ku rewşa heyî dê bi berdana çalakvanan aram bibe.

**Xwepêşandan belav bûn**

Piştî çalakiyên Silêmaniyê di 3'yê kanûnê de jî welatiyên navçeya Şarezurê jî tev li çalakiyan bûn û rêya sereke ya Kelar-Silêmaniyê girtin.

Piştî destpêkirina xwepêşandanan serokwezîrê başûrê Kurdistanê Mesrûr Barzanî, di civîna Desteya Wezîran a Rêveberiya Herêmî ya Kurdistanê de ragihand ku dê dest bi belavkirina mûçeyên karmendan bikin. ***SILÊMANÎ***



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Têkoşîna parastina xwe

Di 9'ê cotmehê de bi pêşengiya dewleta tirk di navbera PDK û Bexdayê de peymanek hat îmzekirin. Li gor peymanê, divê ji derveyî çekdarên girêdayî hikûmeta navendî ya Iraqê, tu hêzên din li Şengalê nebin. Hêzên hene jî divê demildest ji herêmê derkevin û çekên xwe radestî hêzên rejîmê bikin.

Piştî îlankirina naveroka peymanê di serî de gelê Şengalê ji gelek deverên kurd lê dijîn, bertekên xurt li dijî vê peymana îradeya gelê herêmê înkar dike hatin nîşandan. Tevî hemû nerazîbûn û xwepêşandanan, ji aliyên ev peymana korsan îmze kirine ji bo bigihêjin armanca xwe demildest hêzeke zêdetirî 10 hezar çekdar şandin herêmê.

Ev hêza ku piraniya xwe ji polîsên federal ên artêşa Iraqê pêk tên wek gava yekem li ser xeta sînorê di navbera Şengal û rojavayê Kurdistanê de bi cih bû. Cihên ku polîsên leşkerî yên artêşa Iraqê lê bi cih bûne, nûnerên Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê wek dorgirtina Şengalê û amadekariya fermaneke nû nirxandin.

Ji bo pêşgirtina bûyerên nexweş û îhtîmala pevçûna di navbera hêzan de, şandeyek ji Şengalê derbasî Bexdayê bû û di nav de serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazimî, bi gelek aliyên girîng re hevdîtin kirin. Ev yek li Şengalê, ji aliyê gelek kesan ve bi erênî hat dîtin.

Tevî hemû hewildanên şengaliyan, hêzên dagirker ên bi kevneşopiya serdestiyê re tevdigerin îradeya gel ji nedîtî ve hatin. Lewma ji bo li vê herêma ku ji aliyê gelê xwecihî ve tê birêvebirin û parastin îradeya azad têk bibin û serdestiya xwe serwer bikin, ketin nav liv û tevgerê.

Ev hemleya artêşa Iraqê ya bi hevkariya PDK'ê bi pêş dikeve, metirsiya li ser herêmê zêdetir kir. Di şêniyên herêmê de pirsa "gelo dîsa amadekariyên fermanê tên kirin?" çêbû. Ji ber ku gelê herêmê xwedî tecrûbe û ezmûneke xurt bû, ev pirs dikirin.

Hêzên gelê Şengalê di 3'yê Tebaxa 2014'an bê parastin hiştin û bûn sedem ku bi deh hezaran êzidî dîl têkevin destê DAIŞ û bi hezaran jî bên qetilkirin, niha hatine doza maf dikin. Gelê Şengalê van kesan baş nas dike û ji êşên heta niha kişandî jî ezmûneke baş derxistiye.

Gelê herêmê êdî bi tu awayî naxwaze bi ferman û komkujiyan re rû bi rû bimîne. Lewma ew di ferqê de ne ku veguhastina hêzên iraqî û hevkariya PDK'ê ji bo wan tê çi wateyê û bi demdirêjî wê çi bi wan bide wendakirin. Ji ber vê ji heft salî heya heftê saliyan, şengalî îro li ser piyan e û doza mafê xwe dikin.

Cara yekem e ku gelê Şengalê di vê astê de dibe xwedî bîra xweparastinê. Dibe xwedî bira xwe bi xwe birêvebirinê. Êdî ew dizanin xweparastin û xwebirêvebirin ji bo gelan tê çi wateyê û çi bi wan dide qezençkirin. Lewma şêniyên Şengalê ji roja ev peymana qirêj a di bingeha wê de înkarkirina îradeya gelan heye, dizanin tê çi wateyê û dê demdirêj bi herêmê çi bide wendakirin.

Têkoşîna êzidiyan û gelên piştgirî didin berxwedan û hewildanên gelê Şengalê di bingeha xwe de parastina demografiya herêmê heye. Dewletên serdest ango dagirker û bi hevkarên xwe re dixwazin li herêmê îradeya gelê azad ji holê rake. Ji ber vê yekê têkoşîna civaka êzidî dide meşandin, ne têkoşîna parastina herêmeke biçûk e. Di bingeha xwe de xwedî li hebûna xwe derketin e. Lewma têkoşîna îro tê dayîn û xwedîderketina îradeya xwe, ewqas bi nirx û wate ye.

Di dîrokê de cara yekem e ku civaka êzidî ji bo mafê xwe li kolanan e; cara yekem e ku xwe di vê astê de birêxistin dike û têdikoşe. Di van şeş salên piştî fermana çeteyên DAIŞ'ê de bi serê wan de anî û şûn de, şengaliyan xwe baş perwerde kiriye û êdî bûne xwedî fikreke xurt. Lewma tevî hemû hewildanên înkarê jî di asteke hêja de li ber xwe didin. Ev berxwedana keç û xortên êzidî ji bo gelên herêmê jî dibe çavkaniya têkoşîn û moralê.

Pergala îro li Şengalê hatiye avakirin, bi temamî îradeya gelê herêmê û berxwedana wê ve hatiye bidestxistin. Çi dibe bila bibe pêwîst e îradeya gelê Şengalê, gelê ku reseniya herêmê vedibêje bê esasgirtin. Hewildanên hebûn û îradeya gelê Şengalê nas nakin, wê nikaribin li ser vê axa pîroz bigihêjin armanca xwe.

Mixabin sedema vê rewşa aloz û xirab dîsa PDK ye. Li Kurdistanê çi tişta nebaş û xirab hebe di bin de bi awayekî hevkariya PDK'ê derdikeve. Êdî gelê kurd naxwaze bibe qurbanê siyaseta pûç a PDK'ê. Ji ber vê yekê di cewhera têkoşîn û berxwedana gelê Şengalê de, lidijderketina van polîtîkayên şaş ên PDK'ê heye.

Di encama hewildan û berxwedana gelê Şengalê de heya radeyekê pêşniyarên Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê ji hêla hikûmeta Bexdayê ve hatine qebûlkirin. Li gor van hevdîtinan wê hejmarek asayîşa Êzidxanê di nav Şengalê de bimîne, lê li ser hejmara wê hîn li hevkirineke bingehîn çênebûye.

Ev ji bo YBŞ û YJŞ'ê jî derbasdar e. Dîsa li gor peymanê divê Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê xwe fes bike û êdî kar neke. Em bala xwe bidênê, hêzên dagirker di bingehê de êrîşî pergala xweparastin û xwebirêvebirinê dikin. Ger îradeya xweparastin û xwebirêvebirinê ne di destê gel de be, wê demê gel bêîrade dimîne û rê li ber hemû êrîşan vedibe. Ji bo civak bi hewceyî wan bibe û bêyî wan nikaribe tiştekî herî biçûk jî bike dixwazin hîmê civakê têk bibin. Bêguman PDK di vir de dikeve dewrê. Dîsa dixwaze bêje, "Ez ê we biparêzim, bi rê ve bibim û xwedî li we derkevim" lê li gor çi?

Gel xwedîderketin û parastina PDK'ê ya di sala 2014'an de baş dît. Lewma êdî ew bi tu awayî naxwazin wan êşan dubare bijîn. Naxwazin PDK êdî mîna şivanekî li ser serê wan xwe mezin bike.

Berxwedana gel û têkoşîna parastina destkeftiyên gelê herêmê gihaştiye asteke pîroz. Lewma pêwîstî heye ku PDK vê rastiya derketiye holê bibîne û rêz nîşanî vê îradeya azadîxwaz û mafdar bide.



## Li Lîga Şampiyonan hakemtiya jinekê

Hakema fransî ya bi navê Stephanie Frappart, di maça Juventus-Dînamo Kîevê de hakemtî kir. Stephanie Frappart hefteya borî di Lîga Şampiyonan a UEFA'yê de, maça koma G'yê ya di 2'yê qanûnê de hat lîstin hakemtî kir. Di dîroka Lîga Şampiyonan a UEFA'yê de cara yekem hakemeke jin maçek bi rê ve bir. Frappartê (36) salek berê jî di lîstika Super Kupaya Liverpool-Chelsea de ya li Stenbolê hatibû lîstin de hakemtî kiribû. Ligel vê yekê di fînala FIFA'ya 2019'an di Kupaya Jinan a Cîhanê de û di meha nîsana sala borî de di Fransa Lîgue 1'î de jî cara yekem wek hakema jin cih girtibû. ***KÎEV***

## Di 5 salan de 233 hezar yemenî hatine kuştin

Şerê navxweyî yê Yemenê 5 sal in di navbera hûsiyan û hikûmeta navendî de didome. Husî ji aliyê Îranê ve tê piştgirîkirin û Koalîsyona Ereban jî alîkariya hikûmeta navendî dike. Neteweyên Yekbûyî (NY) aşkera kir ku di nav 5 salên şerê navxweyî yê Yemenê de 233 hezar kes hatine kuştin û xwest demildest şer bê rawestandin. NY'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku yemenî di rewşeke giran de ne û aşkera kir ku ji sedî 80'yê pêwîstiya yemeniyan bi alîkariya mirovahî heye. Berê jî NY'ê ragihandibû ku nêzî milyonek yemenî pêwîstiya wan bi alîkariya bijîşk û xwarinê heye û li ser 260 hezar kesan metirsiya mirinê heye. Her wiha NY'ê aşkera kiribû ku 20 milyon yemenî nikarin xwe bigihînin xurekên paqij. ***SANA***

# Divê derziya Kovîd-19'ê bêpere be

Li Ewropayê ji bo ku derziya Kovîd-19'ê 'bêpere be û her kes bikaribe xwe bigihînê' 10 tevgerên welatî kampanyaya îmzeyan dane destpêkirin û gotin ku derzî malê hevpar e

Bi belavbûna şewba Kovîd-19'ê ya li ser rûyê cîhanê ku ev nêzî salekê ye berdewam e, gelek caran ceribandinên aşiyê ji Çînê heta DYA, Îngilistan û gelek welatên din, hatibûn kirin. Herî dawî du şîrketên bi navê BioNTech ve Pfizerê di meha mijdarê de dest bi ceribandina testan kiribûn û li gorî analîzên wan ên dawiyê aşiya wan çêkiriye nexweşiya Kovîd-19'ê ji sedî 90 zêdetir encam dabû. Li ser vê yekê gelek dewletên wek DYA û welatên YE'yê bi wan her du şîrketan re peymana doza aşiyê îmze kirin.

Heta niha Pfizer ve BioNTechê bi tevahî ji bo doza aşiyê cara yekem bi DYA'yê re 100 milyon do, bi Yekitiya Ereban re 30 milyon, bi Japonyayê re 120 milyon, bi Kanadayê 20 milyon, Zelandaya Nû re 1,5 milyon û YE'yê re 200 milyon doz, peyman îmze kirin. Şirketê dê piştî vê peymanê ji bo DYA'yê 500 milyon û ji YE'yê jî 100 milyon dozên aşiyê çêbike.


**Li Ewropayê çalakî**

Li cîhanê heta niha bi milyonan mirov bi vê nexweşiyê ketine û ji roja nexweşî belav bûye heta îro, dezenfektan û maske dihatin firotin û vê yekê bi xwe re rewşên aborî yên giran dianîn û hê jî tîne. Niha jî mijara kirînûfirotina aşiyê di rojeva cîhanê de ye. Hefteya borî li Ewropayê ji bo ku derziya dijî Kovîd-19'ê 'bêpere be û her kes bikaribe xwe bigihînê' 10 tevgerên cuda kampanyaya îmzeyan dan destpêkirin. Heta dawiya sala 2021'ê hedef milyonek îmze ye.

**'Derzî, malê hevpar e'**

Li Fransayê komîteyeke ku ji dehan komele, sendîka, partiyan pêk tê piştgirî da kampanyayê. Di nav kesên piştgirî dane de People Health Movement, Oxfam, Partiya Komunîst a Fransa û çepgirên radîkal LFI jî hene. Komîteya pêşeng a kampanyayê daxuyaniyeke nivîskî da û ev tişt anî ziman: "Divê ev derzî bibe malê hevpar ê mirovahiyê. Bi berfirehî bi pereyê cameweriyê hate fînansekirin. Naxwe divê bêpere bikeve xizmeta welatiyan."

Her wiha organîzatoran xwest mafê xwegihandina teşhîs û tedawiyê jî were misogerkirin. ***PARÎS***







# Gefa kuştinê li ermenan dixwin

Piştî kuştina mamosteyê bi navê Samuel Paty, êrîşa dêra Notre Damê û êrîşên lîncê ku di 29'ê cotmeha 2020'an de li Fransayê pêkhatibûn, ji aliyê rêveberiya Parîsê ve saziyên bi navê 'Ulku Ocaklari' û 'Bozkurt'an hatibûn girtin.

Her wiha li Almanyayê jî di 18'ê mijdarê de CDU/CSU (Partiyên Yekitiya Xiristiyan) ku li Almanyayê hikûmetê pêk tînin û Partiya Demokratên Sosyal (SPD), Partiya Keskan û Partiya Demokratên Hur (FDP) jî ji bo qedexekirina Tevgera Ulkucu pêşnumeya yasayê li Meclisa Federal qebûl kiribû.

Van demên dawî nijadperestên tirk ku bi navê 'Ulkuculer' û 'Bozkurtlar' rêxistin dibin, li Ewropayê gefê li ewlehiyê dixwin. Hefteya borî jî li Almanyayê derkete holê ku ev komên Bozkurtan ên li Almanyayê wek 'Grauen Wölfe' tên pênasekirin êdî gefa kuştinê li ermenên li Almanyayê dixwin. Gefan bi rêya nameyan dixwin.

Li gorî nûçeya rojnameya Die Weltê ya li Almanyayê rojana weşanê dike, herî zêde li Hanu, Osnabrûck û Hambûrgê gefa kuştinê li ermenan hatine xwarin.

Hate gotin ku bi taybetî piştî şerê di navbera Azerbeycan û Ermenistanê de nameyên gefxwarinê zêde bûne. ***BERLÎN***



Destar

Ehmed Pelda

# Teknolojî û kurd

Peyva teknolojiyê vê gavê gelekî populer e. Kesek çawa her roj li ser û çavên xwe mêze dike, an jî cil û bergên cuda li xwe dike, alavên teknolojiyê jî wisa bi kar tîne. Mebest erka (herk) wê alavê nîn e. Ya pêwîst îmaja wê, hêmana wê û xwedaniya rola wê ye. Çawa berê dê, bav, xwişk û birayên me xemlên cihêreng bi kar dianîn eynî wisa. Ji gustîl, bazin, morî heta gerdeniyan cure bi cure xemil an jî berhemên wê ve eleqedar dibûn. Niha jî berhemên teknolojiyê yên populer hene.

Kîjan dibe bila bibe berhemên dibin bersiva pêdiviyan an jî yên xemlên kêfxweşiyê didin mirovan, bi kedeke hêja û zehmet tên çêkirin. Ji bîr nekin her cure ked jî xwedî pîşe û hunerekê ye. Jixwe huner tunebûya, mirov çiqasî bixebitin jî nikarin bibin hunermend û pîşesaz. Kesî xwedan pîşe dikare tiştekî saz bike. Heskî destgeh be, heskî marangozxaneyek be, heskî karxaneya hesinkariyê be, heskî çêkirina ta û derziyê be... Her yek jî divê di ber destê pîşesaz re derbas bibe. Wek vê kesê hunermend jî xwedanê aferineriyêkê ye, jixwe hunera wî nîn be nikare mendê jî ava bike. Çawa hişmendek bi peyvan, pergala fikriyariyê rêz dike, hunermend jî taybetiya aferinariya xwe berheman kêlî bi kêlî dinexişîne.

Ew berhem, amûr û alavên çêkirî, navgînên sazkirî yên payebilind, bi hêsanî teşe nagirin.

Bi keda deh hezaran salan lêbar e. Ji zemanê bihurî ve heyanî niha, destê me jî di nav berhemdariyê de heye. Me tevgera xwe bi alavan ristandiye. Pratîka me di zimanê me de jî jiyaye. Wekî tewn, tewandin, kelandin, qelandin, qijilandin, ristandin, vereşandin, hûnandin ... her yek van nîşana sirûşta takekes bixwe ye, lê ji her yekê van peyvan ji bo çêkirin, sazkirin, avakirin û xerakirinê jî hatiye bikaranîn. Ev jî nîşan dide ku di çanda me ya fikirîn, afirandin, çêkirin û sazkirinê de em xwebixwe raçev dikin. Reng û rîçalê derûniya xwe, şiklê bedena xwe, dirûv û qerekterê hebûna xwe li karê xwe, barê xwe, berhema xwe û rewîşta xwe bar dikin.

Berhema teknolojiyê ya herî girîng û bi pergal tewn e. Tewna bi tevgera sîstematîk sazbûyî, bûye hîmê çêkirina karxaneyên tekstîlê, lê ya herî hêsan, ya herî aferîner, ya herî bikêr sazûmaniya teşiyê ye. Bi nîk, serteşî û duvik wek maşîneya hilberîner a takekesî ye. Ev maşîne dema meşê jî dixebite. Wekî kesek gava dimeşe bi ahengeke zerp teşiyê ba dide, teşî jî li dor xwe dizivire/dilûre. Kêliya bi destekê teşiyê bagirtî digire, bi destê din hêdî hêdî hiriyê dide nikilê nîk ve girêdayî. Hêdî hêdî divuk li ber jêr diçe destê teşî girtî jî li ber jor diçe. Bi vî awayî hiriya rêstandî û dibe bend çêdibe. Pey re teşîrês divuk digire û bend lê dialîne.

Heyama ku teşîrêsek dest bi vî karî dikin, di ber de karekî din jî dikin. Wekî mînak, dibe ku li ser pişta dayikê zarokek virnî û razayî hebe û vê dayikê kerekî barkirî dabe pêşiya xwe û bi xeleta diçe ziyareta hezkiriyên xwe.

Niha lê binêrin bi tevgerekê çend tişt pêk tên. Kirdeya kar: 1- Plankirî ye, 2-Dimeşe, 3- Dirêse, 4- Xumamiyê/dêtiyê dike, 5- Diajo û 6- Ziyaretê dike. Her yek dîmeneke zemanekî ye, her yek dîmeneke girêdayî zemînekê ye û her yek, beşeke jiyanî ya cuda ye. Li ser bifikirin û bala xwe bidinê îro pergala destgehên pîşesaziyê bi beşên cuda, pêk hatine û hemû beşek erkekê tîne cih ku berhem jî di encama tevkariya van beşan de digihêje teşeyekê.

Ne hewceyî pesnê ye ku em bibêjin dîrok û çanda me berhemdar, zengîn, aferîner û piralî ye. Ji ber ku her civatekê li gor erd û cih û pêwîstiyên xwe navgînên xwe çêkirine. Li ser vê jî rengek dane çanda xwe, can dane jiyana xwe. Em dikarin bibêjin; her çiqas ji ber sebebên modernîzmê yan jî talana li ser welatê me, em bêçare ne ku tiştan biguherînin. Her wiha derengmayîna me jî êdî nayê dermankirin ku ji ber vê jî em bûne bendeyê hêzên derî mala xwe.

Divê em ji xwe vegerin û bi bîr bînin, çawa berî xalîçeyekê derxînin, me dikaribû destgehên tevnê bi rêkûpêk çêkin, her wiha desenê xalîçe li ser kaxezan nexş dikirin. Yên ev huner pêşkêş dikirin kî bûn? Kesê nexşê çêdike wek mîmarê îroyîn, kesê tevnê çêdike wek endezyarê maşîneyên fabrîqeyan, kesên rîs dirêsin wek kargehên tekstîlê û kesên dest pê dikin guliyê xalîçeyê dihûnin wek kedkar û karkeran îroyîn in. Heke vê bidin ber çavan, wê çaxê bi hêsanî tê dîtin ku em ne civateke hêsan û bêkêr û nezan in. Berevajî wê diyar e ku gewherê zanînê li ba me heye, meyayî ye, têkûz e.

Tenê em hişyar bin, li xwe veger in û rabin ser xwe. Êdî qetandina bendan hêsan e. Şikênandin tewla werîsan ne dereng e ku em bikarin kapê xwe bidin destê xwe. Wê çaxê bi hêsanî dikarin li ser hîmê mayînên kal û bavan berhem û alav û amûr û navgînên bêhempa saz bikin. Her wiha bi bêminetî pergala civaka xwe jî ji nû ve saz bikin. Hemû jî pêkan in; li benda serxwebûna me ya yeko yekoyî ye...


Wêne: Nurî Bîlge Ceylan


Ayhan Erkmen

# Zivistan û cimetên berê

Zivistana Qersê hêdî hedî rûyê xwe nîşan da. Belekiyên berfê daketine çiyan. Zivistan niha jî tivdarekê gund û bajaran dike. Lê gundî û bajariyan ji bo pêşwaziyê tivdarekên wê qedandine. Qaz ser jêkirine, iyar bi penêrên çîçal tijî kirine, barên êr û kartolan dane ser hev; bi xêra kaya Amed û Rihayê kadîn jî dagirtine, de tê jî bila ser xêrê bê. Lê temên zivistanên berê tu nîne. Ne berf wekî berê dikeve, ne jî di dîwanan de cimet dicivin. Vê ceyranê, televîzyonê û serda jî înternetê emana civakê birandiye!

Bendavên salên dawî avhewa guhertiye. Ji berê bi bilindahiya avahiyan berf diket, şepeyên berfê wek giran bûn. Gundiyan dirûngeyên pêz li ser datanîn. Dengê xirmexirma gihayê di nav diranên pêz de dengekî çi heweskar bû. Yaşo, li ber duringê dihate eşqê û dest bi stranê dikir:

*ez berf im berf im berf im*
*lê lê nar lê lê nar*
*ez berfa çiyakê reş im*
*lê lê nar tu delal î...*

Ji dûr ve Hiko deng didayê "Oryo, Yaşo strana Qazê bêje, ya Qazê." Yaşo dest pê dikir bi teqil digot Hiko jî ev vedigerand.

Cimet bi êvaran di dîwanan de diciviya. Sobêyên kerma har dibûn. Hela kermê pêz tiştekî nedîtibûn. Kal germ nedibûn, belîf diavêtin ber sobê û pişta xwe didanê, carinan di cî bi cî de xewmaşkî dibûn, bi hişyarbûnê ji nişka va digotin:

"hi çi bû, çi bû" yê kêlekê bi henekî digot "xalî serê tebû" pirqînî dikete me zarokan, îja gef û çêr dibarîn.

"Hî tulên heram, çi dikenin, derkevin" me jî bi tavilê dengê xwe dibirî û ji nebîhîstî ve dihatin. Şevên zivistanê dirêj bûn, tarî di saet çaran de dikete erdê, ji pey şîvan me berê xwe dida odeyan. Di dîwanê de her kesî şûna xwe zanibû. Nizam nêvan, mêvanek bihata, wê gavê li gorî temenê wî mêvanî jê re cih dihate vekirin, yên rêzê, dor bi dor cih diguherandin.

Di bin wê ronahiya gazocaxiyê de, dengê xuşîniya qazana ser sobê û gujîniya tipiya derva tev li dengê çîrokvan û dengbêjan dibû. Xwedêyo! Çi bextewarî bû. Bi belavbûna cîranan tembîh dikirin "ji tipiyê, rê winda nekin ha" mezin li ba wan tunebûna, zarok bi qetî tenê bernedidan, yek pê re dişandin.

Di wan şevan de mezinan bi têra xwe çay vedixwarin, lê em zarok li benda îskanên wan diman. Yên ku venexwara me îskanên wan têwerdida û yek, du qult jî me vedixwar. Qet ji bîra min naçe, rehmetiyê apê min çûbû bajêr û bi vegerê ji cimetê re kase loqim û qutî kalêt anîbûn. Para her hesî, yek, du lib loqimên nav kalêtan ketibû. Ez hê jî ji mala xwe re dema loqiman bistînim, kalêtan jî distînim, lê temên wan jî ne mîna yên berê ne.

Salekê xelaya kayê çêbûbû. Gundî çûbûn Konyayê kayê û bi trênê ka anîbûn. Îja çend rojan mijara sohbeta odeyê, dîtin, kirin û xwarinên wê derê bûn. Li wir çûbûn sînemayê û televîzyon temaşe kiribûn. Wisa xweş xweş behsa wan dikirin ku kesên nedîtî digotin "neûzûbîllah qiyamet wê biqete." Îja bi hatinê kestane jî anîbûn. De nizam ji malên xwe re çiqas anîbûn, lê çend kîlo jî ji cimetê re anîbûn. Me jî jê yek du lib xwarin, mîratê tema wan çi xweş bû.

Îja dema stranê bihata diavêtin ber hev; hinekan xwe nedigirt radibûn govendê, girminî polê odê dixistin. Xwediyê malê ji şermana tiştek nedigot, lê yek, du kes dibûn dilbendê dilê wî "kuro hêdî, kuro hêdî, hûn ê polê odê bişkênin."

Bi belavbûna cimetê re, karên qîz û bûkan dest pê dikir. Dip duzena odê, nedihîştin serê sibê; çi dibû, çi nedibû, dibe ku hema yekî li dêrî xist. Derî û pencere vedikirin, balîf û mînder dikutan û gêziyek diavêtin odê. De kî jî dihat, bila li ser seran û ser çavan bihata.



# Du hevalên Evdalê Zeynikê: Feqiyê Qizqapanê û Ferîkê Kor


Sedat Ulugana

**Feqiyê Qizqapanê li gor dema xwe dengbêjekî naskirî bûye û bi Evdalê Zeynikê re di heman dîwanê de kilam gotine. Bêhtir kilamên li ser mala paşê yên feqî ne: Kilama Salih Begê, Bavê Edo, Mala Paşê…**

Çawa tê behskirin, sê merivên paşê bijare bûne. Yek şeneyê wî (tehsîldar) Mihemedê Horê, rûsipî û şêwirmendê wî Dêlê Hoko û dengbêjê wî Feqiyê Qizqapanê... Rojeke havînê, danê nîvro li gundê Koçeriyê (girêdayî Elcewazê ye) yê li devê behra Wanê Kor Huseyîn Paşayê Heyderî li ser kaloriya xwe ya bi tek, xwe dirêj kiriye û dengbêjê wî Feqiyê Qizqapanê jî jê re kilaman dibêje. Wextê paşa di xew re diçe û çavên xwe digire. Paşa mîna zareke bêşikê nişkêva çavên xwe vedike û yaneyan li Feqî dinhêre. Feqî jî careke din dest bi kilamê dike û paşa dikeve xeweke giran. Tê gotin ku heya Feqî kilam negota, xewa paşê nedihat. Vê yekê jî rûspiyê paşê Dêlê Hoko dibêje. Dengbêj Sadiqê Cergeşînê jî dibêje; "Dengê Feqî sewalê çolê bile dixist xewa şirîn. Dengê wî hinde li însên tesîr dikir."

**Dev ji medreseyê berdide**

Feqî kengî ji dayik bûye û kengî miriye nizanim, lê dîroka sirgûnkirina Kor Huseyîn Paşayê Heyderî 1926 e. Ev bîranîna jorê ya Feqî û Paşa qey beriya sala 1926'an qewimiye. Îhtimaleke mezin di salên 1910'an de qewimiye ku paşa wê demê hê dikaribû jî bo berhevkirina bacê Mihemedê Horê erkedar bike. Yanî hê komara Tirkiyeyê nehatibû avakirin. Feqî ji gundê bi navê Qizqapanê bûye ku ev gund îro girêdayî Panosê ye. Demeke dirêj li Dignûkê (girêdayî Milazgirê ye) medreseyê dixwîne lê ji ber ku êmla wî her dem li ser kilaman bûye, dev ji medreseyê berdide û dest bi dengbêjiyê dike. Hinek jî dibêjin; dilê feqî dikeve qîza mele, mele qîzikê nadê, ew jî dev ji medreseyê berdide û her wiha kilama bi navê Feqî/qîza Mele ya bi dengê Şakiro gihîştiye roja me jî ya wî ye.

**Çîroka Sofî Mexso**

Belê dibe ev çîrok rast be yan jî ne rast e lê em dizanin ku di nav pergala medresê de dengbêjî û bengîtî ne kêm bûye. Ahmedê Mirazî (bixwe jî dengbêj bû) dibêje: "Dema ez li Gîhadînê di medreseyê de şagirt bûm, hevalekî me hebû, navê wî jî Sofî Mexso bû. Sofî Mexso bûbû aşiqê Helîmeyê. Helîme pir genc bû, ew dabûn kalekî. Sofî Mexso li ser Helîmeyê bengî bûbû. Dema me dersên xwe ezber dikirin, wî jî destê xwe dibir peleguha xwe û kilam digotin. Sofî Mexso û Helîme rojekê ji nişkê va wenda bûn. Kesî rêça wan êdî rast nekir." Mixabin li ser bengîbûn û serpêhatiya Feqî ya li medresa Dignûkê tu agahiyên me tune ne, lê çawa Evdalê Zeynikê dengbêjê Surmelî Memed Paşa bûye, Feqî jî dengbêjê Kor Huseyîn Paşa bûye û navê wî di çîroka paşê de derbas dibe. Feqî li gor dema xwe dengbêjekî naskirî bûye û bi Evdalê Zeynikê re di heman dîwanê de kilam gotiye. Bêhtir kilamên li ser mala paşê, yên feqî ne: Kilama Salih Begê, Bavê Edo, Mala Paşê...

**Dengbêjê Rizayê Xalit**

Ferîkê Kor şagirtê Feqî ye û ji gundê Axtepeyê bûye. Axtepe di qontara çiyayê Sîpanê de ne û girêdayî Elcewazê ye. Lewma hinek jî jê re dibêjin Ferîkê Axtepeyê. Ferîk dengbêjê Rizayê Xalit bûye. Wî bêhtir kilamên mêrantiyê û yên şeran gotine. Yanî ew wek Feqî "romantîk" nebûye lê hevalê Feqî yê nêz bûye û her duyan ji hev kilam girtine.

Terza Ferîk terzeke xerîb bûye. Dengbêj Sadiq digot, "Dema Ferîk kilamên Bişêriyê û yên mala Bişarê Çeto digot, te li kozikên şervanan digerand. Tu diketî nav şêr. Hinde bi tesîr bû. Dengê wî mîna aveke zirav diherikî."

**Piştre vedigere Axtepeyê**

Kilama wî ya herî navdar a "Lo lo Riza / Bavê Koroxlî" ye. Çawa tê zanîn di Gulana 1909'an de Îttihat û Taşnakî jehrê didin Rizayê Xalit û wî dikujin. Piştî mirina Riza, Ferîk jî vedigere Axtepeyê. Dengbêj Sadiq digot: "Ferîk ji min re digot, 'wexta ez vegeriyam Axtepeyê, min û Evdalê Zeynikê me li Êrşatê (girêdayî Erdîşê ye) mala Silêmanê Ferho tev kilam gotine. Ez wê çaxê pir genc bûm û hê çavên min didîtin. Evdal jî pir kal bû. Li hespê siwar kiribûn, ew anîn gund. Dengê wî he jî zîz bû, çavên wî êdî kor bûbûn, lê hê jî li ser xwe bû. Wî dest pê kir, paşê jî min jê îzin stand û kilam got, keniya got, tu çiraxê Feqî yî."

**Ferîk jî kor dibe**

Belê heman yek tê serê Ferîk jî. Ferîk di dawiya emrê xwe de kor dibe. Îhtimaleke mezin di salên 1970'yî de dimire. Ji ber ku bavê min jî digot; "Min di zaroktiya xwe de Ferîk dît." Şagirtê Ferîk jî dengbêj Mistefayê Satilvala, Mihemedê Hecî Reşat û Dengbêj Sadiqê Cergeşînê bû. Min di sala 2015'an de bi dengbêj Sadiq re roportajek kir û ew pêrar çû ber dilovaniya xwe, lê mixabin ez negihîştim Mihemedê Hecî Reşat û Mistefaya Satilvala.

# Veng bidê hawarê zindanan



Mahîr Uzmez

*"Zindanî 18 aşman ra pey reyna bi grevê vêşanîye rojdem de yê. Vaştoxê grevê vêşanîye mîyan de peynîardişê sîstemê tecrîdê Îmraliyî zî esto."*

Mîyan serranê 2013 û 2015 de di heyetê dewlete Rayberê Şarê Kurdî birêz Ocalanî reyde derheqê pêvajoyê aşîtîye de pêvînayîş viraştî. Wexto ke eno pêvînayîş terafê îqtîdarê AKPyî ra hamey qedênayene, ay wext ra heya eno wext Rayberê Şarê Kurdî birêz Ocalanî hem avukatanê xo reyde û hem zî keyeyê xo reyde tena di pêvînayîşan viraşto.

23ê êlule de semedê niştoxê nexşê rayîrî, dewleta tirke şeş aşmî ceza dabî Ocalanî. Eno qerarê dewlete semedê tepişteyan adirê fîtîlê pana.

Nizdîbîyayîşê faşîzmê AKP-MHPyî çarçeweya pirsgireka kurdî de û nizdîbîyayîşê girawa Îmraliyî ra dîyar beno. Dewleta tirke berê girawa Îmraliyî key ganê cê biwaza akena, key ganê cê nêwaza padena.

Eno nizdîbîyayîşê dewleta tirkî hetê şarê kurdî ra qet nêhame qebulkerdiş. Eno çarçewe de îtirazo tewr pîl hertim zîndanan ra hame.

Tirkîya û Vakurê Kurdistanî de 27ê Teşrîna Peyêne de tepişteyanê PKK û PAJKyî dest pê çalakîya grevê vêşanîye yê bêdem û bêagêrayîşî kerdî.

Tepiştoxî bi rayîrê keyeyanê xo yew mesaj erşawitî teber. Tepiştoxî mesajê xo de bale antî serê hemleya "Tecrîd rê, Faşîzm rê, Dagirkerîye rê bes" o û eno ardî ziwan ser:

"Ma tepiştoxê PKK û PAJKî bi rihê 14ê Temmuze tewrê eno hemlaya xoverdayîşî benê û tîya ra eşkera kenê ke; heta ke Sîstemê Tecrîd û Îşkenceyê Îmraliyî nêqedîyo û heta azadîya şarê ma pê nêro ma zî mîyanê tekoşînî de cayê xo gênê û rolê xo kay kenê. Heta tecrîd biqedo ma do xo ver bidê ..."

Bi eno eşkerayîye tepişteyî 27ê teşrîna peyêne de dest pê çalakîya grevê vêşanîye kerdî.

Tepiştoxî eşkerayîye de veng dayî raya pêroyî û vatî: "Ma veng dana şarê xo, dezgeh û sazgehanê demokratîkan û rayaumûmîye ke hîsgerîye tewrê prosesî bibê û çi deste înan ra yeno, wa bikerê."

**Tepiştoxî timî mîyanê têkoşînî de bî**

Tekoşînê azadîye mîyan de tepiştoxî timî vernî de cayê xo girewtî. Hem verva faşîzmê 12ê Êlule de hem zî verva pêroyê îqtîdarê ke rayîrê 12ê Êlule de şîyî de têkoşîn berz kerdî û xoverdayîşê tarîxî gam bi gam neqş kerdî. Bi çalakîya 14ê Temmuze tepiştoxî faşîzmê 12ê Êlule têk berdî. Bi esaretê birêz Ocalanî hepsî çalakîyanê xo hîna berz kerdî û çalakîyanê fedaîyaneyan pê ardî.

Tepiştoxî verva tecrîdê serê birêz Ocalanî de çalakîya tewr girde 12ê Êlula 2012î de pê ardî. Eno tarîx semedê tepişteyan zaf muhîm bî. Çimkî eno roje hem hesab persîna faşîzmî bî û hem zî hesab persîna sîstemê tecrîd û îşkenceyê Îmraliyî bî.

Hezaran tepiştoxî 67 rojan grevê xo yê vêşanîye berdewam kerdî. Çalakîya înan encam girewt. Tecrîd qedîya û bi eno çalakî pêvajoyê aşîtî dest pê kerd. Tepiştoxî reyna 14ê Temmuze de yew darbeyêko pîl dayî faşîzmî ro û ser kewtî.

Pêvajoyê aşîtîye 24ê Temmuza 2015î de terafê hukmatê AKPyî ra ame rijnayîş. Dima ra Îmrali de tecrîd dest pê kerd. Ena ray tecrîd tena Îmrali de nê hema hema hema pêroyê civakî ser o hame viraştiş. Mîyanê înan de parlamenter, şaredar, rojnameger û aktîvîstê sîvîl û xeylê kesê bînî pêl bi pêl hameyî tepiştiş û civak qirkerdişê sîyasî reyde rî bi rî mend.

**Reyna zindanan ra veng vejîya**

7ê aşma Teşrîna Peyêne ya 2018î de parlamentera Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) Leyla Guvene verva enê teda û neheqîyan de nêeşkaye bêveng bimana û zindan de dest bi grevê vêşanîye yê bêdem û bêagêrayîşî kerde. Çend rojan ra dima çalakîya Leyla Guvene heme zindanan de bî vila.

Çalakîya grevê vêşanîye roj bi roj pîl bî. 30 heb zindanan de 250 ra vêşêr tepiştoxî Leyla Guvene ra dima dest pê grevê vêşanîye kerdî. Grevê vêşanîye ena ray tena zindan de nêmend, vila bî pêroyê cayê dinya. Vernî de Strasbourg de, merkezê Komîteya Vernîgirewtişê Muameleyo Xirab û Îşkenceyî ya Ewropa (CPT) û Konseya Ewropa de yew çalakî dest pê kerd. Tira pey Başûrê Kurdistan, Almanya, Fransa, Swîsre, Brîtanya, Îtalya û Kanada de desan tenî dest bi grevê vêşanîye yê bêdem û bêagêrayîşî kerdî.

Xoverdayîş roj bi roj pîl bîyêne û dewleta tirk verva eno çalakîye de neçar mendî bî. Bi yew qerarêk suprîz Leyla Guvene zindan ra hameye veradayîş. Labelê Leyla Guvene keyeyê xo de çalakîya xo berdewam kerde.

Tepiştoxî reyêk qerar dabî û heta peynî waştêne yew encam bigîrê. Kişta grevê vêşanîye de Ewropa de Ugur Şakar, zindan de Zulkuf Gezen, Ayten Behçet, Zehra Saglam, Medya Çinar, Siraç Yuksek, Yonca Akici û Mahsum Pamayî semedm protestokerdişê tecrîdî canê xo ronayî werte û çalakîya fedaîyane pê ardî.


Enê çalakîyan ra dima Wezîrê Edaletî Abdulhamît Gul mecbur mend eşkerayîyêk bido û eşkerayîye de vat; vernîya pêvînayîşê avukatan û birêz Ocalanî de yew pirsgirek çinî yo û avukatî key biwazî eşkenê şêrê girawa Îmraliyî.


Çalakîya tepiştoxan reyna encam girewt û berê Îmraliyî abî. 8 serran ra pey avukatî şîyî girawa Îmraliyî.

Avukatî 2-22ê aşma Gulane de, 12-18ê aşma Hezîrane û 7ê aşma Tebaxa 2019î de 5 rayan birêz Ocalanî reyde zîyaret pê ardî. Leyla Guven bi mesajê birêz Ocalanî çalakîya xo roja 200ine de qedêna.

Labelê tecrîd tirapey reyna dekowt dewre, 7ê Tebaxa 2019 ra heta enka berê Îmraliyî reyna padîyayî. Dozger û Hakîmî heme muracatê avukatan bêbersiv vera danî, yan zî eşkere vanê ma destûrê pêvînayîşî nêdanê.

Eno rewşe de tepiştoxî reyna bêveng nêmendî. 27ê Teşrîna Peyêne ya 2020î de dest bi yewa grevêk newe kerdî. Heme kes zano ke eno kaoso ke Rojhelato Mîyanen û Tirkîya de esto, sedemê cê Sîstemê Tecrîd û Îşkenceyê Îmraliyî yo. Coka kamo/a ke Rojhelato Mîyanenî û Tirkîya de aramî wazen/a lazimo veng bido/a vengê tepiştoxan û tepiştoxan eno çalakî de tena nêverdo/a.





# Dişmenê kurdan ra dost nêbeno

Kamo

Ez vana tarîxê Kurdan de prosesê ewroyî ra hîna giran, hîna zehmet yew proses derbaz nêbîyo.

Çunke qet yew wext de Kurdî hende wayîrê hêzî nêbîyê û hende zî yewbînan rê didanî nêqirişnayê. Mabênê hende dişmenan de yewbînî xirab nêmusnayê.

Kurdan Başur de yew statuyo muhîm girewto xo dest û no destkewtiş hetê yewîya netewbîyayîşî ra zaf muhîm o.

Kurdan Rojava de bi ked û erjeyanê pîlan mucadeleyo muhîm dayo, destkewtişê muhîmî girewtê xo dest û nê destkewtişî zî hetê netewbîyayîşî ra bêemsal ê.

Kurdan Bakur de bi serran o mucadeleyê xo kerdo berz û no mucadele ewro nêzdîyê netîce girewtêne yo.

Başur de rewşa KDP û Şengalî malumê her kesî ya. Şengal seba ke destê Êzîdîyan de nêmano û seba ke Êzîdîyî îdareyê xo menê ro û hetê asayîş û pawitişî ra xo nêpawê, hukmatê Başur ê Kurdistanî Şengal û Êzîdîyî dayî destê Iraqî. Yanê Kurdê Êzîdîyî yan binê kontrolê mi de manenê, yan zî binê kontrolê Ereban de. Êzîdîyî bawerîya xo bi KDP nêanê. No sebeb ra zî KDP va şima ya benê tabîyê mi yan zî ez şima dana destê Ereban. Tabî no hesab ê Tirkîya yo. Çunke Tirkîya nêwazena PKK uca de ca bigîro.

Rojava de mucadele hîna zî dewam keno û seba ke Surîye de zî Kurdan rê yew statuyo mende bêro ronayene xoverdayîş dewam keno. La baş êno zanayene ke uca de zî KDP (bi destê ENKS) û Tirkîya pîya hereket kenê.

Reyna her hetê Başurê Kurdistanî de nuqteyê leşkerî yê Tirkîya ameyê ronayene û Tirkîya û KDP pîya vera PKKyî mucadele kenê. Merdim vano qey Bakur de mabênê Kurdan û Tirkîya zaf baş o û PKK Kurdan rê dişmenîye keno. La Bakur de vera îqtîdarê kolonyalîstî mucadele hîna zî bêmabên dewam keno û Kurdê bakurî her roj raştê zulm û zordarîye ênê, her roj ênê kiştene û îqtîdar ney eşkera, verê çimanê pêroyê dinyaye de keno.

Rewşa winasîye de yewîya netewbîyayîşê Kurdan ra êna qalkerdene. Birakujîye (yewbînîkiştişê Kurdan) rê lanetî ênê wendene. Helbet ganî lanet bêro wendene. Hezar dolime lanet bêro o keso ke waûbirayê xo rê dest keno berz, tifang dergê ci keno rê.

Merdim ke tarîxê mucadeleyanê Kurdan de nîyadano eşkeno vajo yewbînî ra dûrî bîyê, têkilîye nêeşkîya binê ro, yewbînî ra xebera xo çin bîya, seba ke coxrafyaya hîraye de bîyê, nêeşkîyo xo biresnê yewbînî. La ewro... Ewro pêro hêzê Kurdan zaf nêzdîyê yewînî yê û eke biwazê eynî roje de eşkenê têkilîye binê ro û seba şarê Kurdî eşkenê bêrê têhet. La problem esto. No problem problemê Kurdan bi xo nîyo. Problemê Tirkîya, Iraq, Îran û Surîye yo. Nê kolonyalîstî bîyê yew û nêwazenê mabênê Kurdan de yewîye bêro ronayene. Karê xo yê qilêrînî zî bi destê Kurdan vînenê û kenê ke Kurdan bi Kurda bidê qirkerdene.

Bi nê halî qet yew parçeyê Kurdistanî de, rewşa qet kesî garantî nîya. Şengal de veng û hêzê Êzîdîyan ke bêro birnayene, kara xo nêresena Erbîl û Duhokî. Başur de destê KDP û YNKyî ke bêro şikitene, PKK nêbeno wayîrê hêzî. PKK ke mabên ra bêro wedarnayene, qet yew hêzê Kurdistanî rê parçeyê ca nêmaneno.

Ganî na baş bêro fam kerdene: Kurdî ewro her wextî ra hîna zêde azadîye ra bîyê nêzdî û tarîxê verî ra nat şarê Kurdî seba naye canê xo, malê xo dayo û no mîras mîrasê şarê Kurdî yo. Ê yew keyeyî, yew eşîre, yew hukmat û yew rayîrberî nîyê nê destkewtişî. Heqa qet yew Kurdî çin a ke nê destkewtişanê bi seyan serran bikero xirabe û şarê Kurdî goreyê hereman, goreyê keyeyan, goreyê eşîran û goreyê partîyan bikero cîya û bierzo dişmenanê Kurdan ver.

Azadîya Kurdan bi yewbîyayena Kurdan mumkîn a. Yewîye ke nêro ronayene, dişmenê Kurdan erdê Kurdan de hîna zaaf zaf zêde Kurdan do bikişê.

Ganî ma xo vîra mekîme: Dişmen dişmenê Kurdan o, dişmenê filan partîye û bêvan kesî nîyo. Dişemenê Kurdî nêbeno dostê filan partîya Kurdan û bêvan rayîrberê Kurdî.


Dişmen tena Bakur de nê, Başur de zî, Rojava de zî eynî dişmen o. Ma referandumê Başurê Kurdistanî de no eşkera dî.

Bêrê polîtîkayanê qilêrinan ê Tirkîya, Iraq, Îran û Surîye ra dûrî, bi nameyê şarê xo, bi axa şehîd û erjeyanê Kurdistanî destê xo binîme wîjdanê xo ser û seba her ferdê Kurdî, seba her bostê erdê Kurdistanî pîya mucadeleyê xo bikîme berz.

Çunke ewro kurdî her parçeyê Kurdistanî de payan ser o yê û wayîrê ferasetê neteweyî yê. Yewbîyayîyê ma bena azadîye.




# Tiştanok (mamik)



**1-** Mamê mino mamanî
Garana mama, girte çema, sibê rabû yek jî nema.
kî dizane ev çi ye?

**2-** Mamê mino mamanî
Giya dixwe bizin nîne, hêka dike mirîşk nîne, wek kevir e kevir nîne

**3-** Mamê mino mamanî
Guyê mêşê ye xwarina axa û paşê ye

***Çavkanî:  Hilmî Akyol***

Me dîsa ji we re çend tiştanokên (mamik) xweş amade kirine. Em bi hêvî ne ku dîsa li gorî dilê we bin. Bi malbatî dîsa van mamikan ji hev bipirsin û tasekê ji kaniya da û dapîran, bav û bapîran vexwin.

**Bersivên me ev in:**

**1-** Stêrk
**2-** Kûsî
**3-** Hingiv

# Zûgotinok

Çaxê we bi xêr delalno.
Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re par vebikin.
De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Heşt hirç**
**Her heşt hirç**
**Pişt bi pirç**


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Heft hesp, heşt hesp**

→ Heke ew jî nebû dê sedî sed ev çêbibe:
**Fikrî sê cara fikirî**
**Ji bo tiştekî bikirî**



***Çavkanî: Pitrûka Zûgotinokan a ji berhevkariya Mihemedê Kurdo***

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Heywaneke dirinde, dijminê şivan û pez e
3. Evîndara Mem 5. Hejmarek 6. Koma giyayê girêdayî
7. Xwarineke taştê ya sereke 9. Dûrîtî 12.Koma pez û bizinan
14. Dayik 15. Xelkê bajêr, kesên li bajaran dijîn
17. Dirb 18. Belam, lêbelê, bes
22. Qereçîtî, seyarî, kesê gelekî diçe û tê û serdana her derê dike

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Tirb, mezel
2. Hindav, hindam
3. Cot, ne fer 4. Tûj 5. Xerîbî
7. Bajarekî bakurê Kurdistanê , Colemêrg
8. Alaveke tûj ya ji bo jêkirinê tê bikaranîn
10. Bersiva erênî
11. Xizmekî gelekî nêz, kurê dê û bavê mirov
13. Sala em tê de
14. Oldarên gerok, sofî
16. (Apê min tê ji deştê, barek stirî li piştê)
19. Ji niha pê ve, ji niha şûn de
20. Rengek ku di ala kurdî de jî heye
21. Sewaleke kedî ku ji goşt, hirî û şîrê wan sûd tê wergirtin
23. Pûşê hêrayî

**Bersiva hefteya borî**

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 S | Û | 2 R | | | | | | 3 C | E | 4 R | |
| I | | E | | | 5 Ê | Z | D | Î | | Î | |
| 6 R | E | W | A | | V | | | | | | |
| | | A | | | A | | 7 S | I | 8 M | | |
| 9 B | 10 Ê | N | D | 11 E | R | | W | | O | | |
| | D | | | V | | | 12 Î | M | R | 13 E | |
| 14 B | Î | | | Î | | | S | | | Ş | |
| E | | | 15 E | N | 16 Q | E | R | E | | Î | |
| 17 Y | E | | | | E | | E | | | 18 R | 19 A |
| R | | | 20 D | | D | | | 21 K | | | N |
| Û | | 22 H | I | N | A | 23 R | T | Î | | | Î |
| T | | | L | | | E | | | | | |



Kewê Redkan

# Mêrê derewçîn

Wexta payîzê wek her kesekî/ê ez jî tedarikên xwe yên zivistanê dikim. Di payîza dereng de, ji bo ku zivistana min bi qeşa, serma û cemedê derbas nebe di nav malê de, li der û dora me çi qas qirş û qal hene berhev dikim. Lê di van deman de hemû mêrên cînarên min ji mal derdikevin, diçin dar û beran didin hev û tînin malê, ew hemû beriya min tedarekên xwe yên zivistanê dikin. Ez jî her roj ji mêrikê xwe yê teral re dibêjim, 'de rabe, tu jî xwe bide kêleka cînaran ji me re dar û beran bîne'. Her tim dibêje 'baş e, ez ê herim' lê tu carê gava xwe neavêtiye derve!

Sibe heta êvara dereng di malê de wek kundê kor û teral radizê; radibe xwarina xwe dixwe, bi vir de û wê de êvar bi ser de tê, dîsa em bê qal û qirş dimînin. Deh roj, bîst roj wisa derbas bûn, min dît ku ew qûna xwe ji erdê ranake, min got vê carê ez ê xwe bigihînim der û cînaran, qet nebe hinek dar jî bînim, dibe ku mêrikê min bê ber rehma xwedê û rabe ser piyan.

Na dayêêê, na. Îro ev karê min heye, sibe ev karê min heye, her roj derewên wî mezintir dibin. Min dît tu xêra wî ji min re tune ye, min got; rabe rabe, rabe here mala bavê xwe, pêlazimiya min ji te tune ye, tu ji ku ve hatî bi wir de biçe.

Dît ku çavên min sor bûne, hêrsa min mezin bûye, agir ji ber çavên min dipeke, tirsiya, destê xwe avêt ser pişta xwe û got; wî pişta min diêşe, zikê min diêşe. Aqil di nav serê min de nema, waye zivistan hat, berfê xwe avêtiye ser çiyayên der û doran, tu nabêjî em ê vê zivistanê çawa derbas bikin, waye derewên te bûn hezar û tu dibêjî; wî pişta min, wî zikê min, wî serê min diêşe, tu karekî ji min re nakî, rabe here, bila çavê min te nebînin.

Heger tu wan cilên xwe jî bi xwe re nebî, ez ê wan hemûyan bişewitînim. Jixwe tiştekî bişewîtinim tune ye, ew cilên te wê têra min bikin. Hemû cînarên min sibe zû radibin tedarekên xwe yên salan dikin, tu rojekê jî ranabî ji min re du keviran nadî ser hev.

Ew çû, ez mam tenê. Roja dinê min xwe da kêleka cînaran, ez çûm, di nav sê rojan de min dar û berên ji bo sê salan dan hev û anîn malê. Piştî çend rojan, min dît xesiya min bi lez û bez hate ber derê min, devê xwe vekir, got û got... Min got here ji ber derê min, kurê te li te bimbarek be tevî derewên xwe; careke din jî neyên ber derê min û loman nekin.

Hemû kesan ji min re digot; mêrikê te derewçîn e, min ji wan bawer nedikir. Min digot qey dexesiyan dikin, çavnebar in lewma. Na haaa, ne wisa ne, ew teral û bêkêr e. Niha xaniyê min germ û dilê min jî rehet e. Derew mala merivan dişewitînin.

# Li Qamişloyê şanoyeke bi navê ‘Yekitî’ hat pêşandan

Bi mebesta derxistina azarên gelê rojavayê Kurdistanê ji ber pêkneanîna yekitiya kurdî, Koma Şehîd Osman a Şanoyê "Bavê Teyar", şanoyeke bi navê ‘Yektî’ amade kir.

Koma Şehîd Osman a Şanoyê ku bi navê ‘Bavê Teyar’ tê nasîn, şanoyeke bi sernavê ‘Yekitî’ di 27’ê mijdarê de li ser torên civakî parve kir.

Şano bi heft lîstikvanan hatiye amadekirin û bi pênûsa nivîskar Behcet Lewend hatiye nivîsandin. Amadekirina şanoyê du mehan domiyaye, dirêjahiya dema şanoyê jî 27 deqe û 10 çirk e.

Di şanoyê de lîstikvan bi rola leşkerên hikûmeta Şamê, dewleta tirk, Amerîka û Rûsyayê lîstine. Naveroka şanoyê li ser çawanî û pêwîstiya avakirina yekitiyê di nav gel û patiyên siyasî de ye. Her wiha şano bi awayekî komedî hatiye çêkirin.


Lîstikvanê ku cihê sereke di şanoya "Yekitî" de girtiye Cuma Xelo (Bavê Teyar) der barê vê şanoyê de axifî.

Xelo diyar kir ku di encama gera di nav gel de wan rewşa wan nas kir û li gorî êş û azarên wan kar dikin û wiha domand: "Di dema dawiyê de rewşa xwestina yekitiyê di nav gel de derket pêş û digotin, divê em bibin yek û yekitî bê avakirin.”

Xelo destnîşan kir ku ew li hev civiyane û biryar dane kar û xebatekê bikin da ku ji gel re bidin xuyakirin ku çi tê xwestin ji bo bibin yek, ji ber li ser pişta kurdan bazar tên kirin û divê ji vê bazara dinyayê xilas bibin. Xelo wiha domand: “Divê em yek bin da ku dijminê me li hemberî me lawaz bibe, me xwest em li ser vê bingehê karekî bikin."

Her wiha Xelo behsa çimabûna yekitiyê û cihgirtina wê di hundirê şanoyê de kir û got: "Bi tenê yekitî layiqî xwîna van şehîdan e, heke yekitî çênebe wê destkeftiyên niha di destê me de li rojavayê Kurdistanê ji destê me derkevin. Ji bo ku em xwedî li xwîn û zarokên şehîdan derkevin pêwîstî bi yekitiyê heye, bi rêya vê şanoyê me xwest em vê bangê bigihînin partî û gelê xwe."

Li ser rola kesên cihê xwe di nav çand û hunerê de digirin wiha got: "Hunermend neynik e, her kes li wî, kar û xebatên wî temaşe dike. Divê hunermend jî kêmaniyê nexe karê xwe û li ser esasê ku çi ji gel re pêwîst dibe kar bike, roj roja ked û xebatê ye." ***QAMIŞLO***



# Li Silêmaniyê festîvala fîlman hat lidarxistin



Di çarçoveya pêngava 16 rojî de, ya têkoşîna li dijî tundiya li jinê, li Silêmaniyê festîvalek fîlman û spotên rêxistinên jinan hat lidarxistin. Di festîvalê de 9 spot û kurtefîlmên li ser tundî û cudahiya rêgezî hatin nîşandan.

Festîval fîlman û spotên rêxistinên jinan, di saetên êvarê de, li Salona Salim a Silêmaniyê di çarçoveya pêngava 16 rojî de, ya têkoşîna li dijî tundiya li jinê, hat lidarxistin.

Di festîvalê de 9 kurtefîlm û spotên têkildarî tundiya li jinê; jinên ji destê DAIŞ’ê rizgar bûne; di dema karantînaya virûsê de tundiya li jinê û di temenê zarok de zewicandin, hatin nîşandan.

Piştî nîşandana fîlm û spotan, nûnerên rêxistinên jinan têkildarî armanca lidarxistina festîvalê axivîn û piştre xelat hatin belavkirin.

Di dawiya festîvalê de çalakvana mafên jinan Bihar Munzir, têkildarî armanca lidarxistina festîvalê ji çapemeniyê re axivî û wiha got: “Ev festîval pêngaveke girîng e ji bo hişyarkirina civakê da ku were zanîn wê çawa xwe ji tundiyê biparêzin û li hemberî tundiyê rawestin.” ***SILÊMANÎ***



# Li Ranyayê pêşbirka wêjeyî

Pêşbirka Wêjeyî ya Yekemîn a Jinên Ciwan ên Têkoşer a herêma Raperînê bi dawî bû. Pêşbirk bi tevlêbûna 23 jinên ciwan pêk hat.

Pêşbirk di 1’ê mijdarê de dest pê kibû. 23 ciwanên Binarê Qendîl, Qeladiz û Ranyayê tev li pêşbirkê bûn. Li bajarokê Ranya bi merasîmekê xelatên jinên bûn yekemîn hatin dayîn. Malbatên şehîdan û gelek welatî tev li merasîmê bûn.

Merasîma pêşbirka wêjeyî ku ji bo bîranîn şehîdên jin ên herêma Raperînê hatibû lidarxistin, bi qedeyeke rêzgirtina ji bo şehîdan dest pê kir.

Di merasîmê de li ser Rêxistina Ciwanên Têkoşer Dîlan Luqman axivî û wiha got: “Ev pêşbirka me beşek ji hişyarkirina civak û jinan e. Me ev pêşbirk ji bo bîranîna şehîdên jin ên herêma Raperînê li dar xist. Ji ber ku şehîdan ji çarenivîsa heyî re gotin na û rastiya jiyanê nîşanî me dan. Li vir her nivîs, helbest û gotar ji bo derxistina qabiliyeta jinên ciwan ên herêma Raperînê ye. Aramanca ew e ku çalakiyên me yên wiha yên di warê nivîs, wêje û zimanê kurdî de hîn zêdetir bi pêş bixin. Jinên ciwan hest û fikrên xwe bi awayê wêjî diyar bikin.”

Piştre jî li ser navê komîteya amadekar Mamosta Sazan axivî û diyar kir ku xebatên bi vî rengî yên wêjeyî yên ji bo jinên ciwan gelek girîng in. Di pêşbirkê de jinên tev li pêşbirkê bûn berhemên xwe xwendin. Piştre jî xelatên jinên bûne yekemîn û duyemîn ji aliyê dayikên şehîdan ve hatin dayîn.

Di beşa çîrokan de Niwar Kawa Ehmed bû yekemîn, Sarya Hisinê bû duyemîn; di beşa meqaleyê de Ajîn Abdullah bû yekemîn û Jilwan Ziyan bû duyemîn; di beşa helbestan de Elin Mihemed bû duyemîn û Zara Ehmed Caf bû yekemîn. ***RANYA***

# Serdema payîzê ya Akademiya Îsmaîl Beşîkçî dest pê dike

Serlêdanên ji bo serdema payîzê ya Akademiya Îsmaîl Beşîkçî dest pê kir. Ders wê di bin sernavê 'Tecrûbeya Perwerdeya Kurdî' de werin dayîn. Armanca xebata akademiyê, di qada kurdî de zanyariyan pêk bîne û belavî civakê bike.

Serdema payîzê ya Akademiya Îsmaîl Beşîkçî wê di navbera 12’ê kanûna 2020’an û 23’yê çileya 2021’ê de pêk were. Ji bo beşdariya li dersan, pêvajoya serlêdanê dest pê kir. Akademî salê du caran, di serdemên payîz û biharê de, heft hefteyan didome.

Akademî dê bi awayê onliîne pêk bê, her sal 30 xwendekarên lîsans, master an doktorayê daxilî bernameya xwe dike. Kesên beşdarî bernameyê bibin divê di asta xwendin û nivîsandinê de bi kurdî baş bizanibin. Beşdarên bi serfirazî bernameyê diqedînin, di dawiya bernameyê de sertîfîkaya beşdariyê distînin.

Bername bi 30 kesan sînordar e. Ew kesên serî lê dane, wê herî dereng di 10’ê kanûna 2020’an de bên agahdarkirin. Bernaneya akademiya payîzê dê li ser bernameya Zoomê pêk bê.

Beşdariya li akademiyê belaş e û kesên bi rêk û pêk beşdarî hemû hefteyên akademiyê bibin, wê Weqfa Îsmaîl Beşîkçî (WÎB) sertîfîkaya beşdarbûnê bide wan.

Ders wê di bin navê 'Tecrûbeya Perwerdeya Kurdî' de werin dayîn ku koordînatorê vê serdemê Cumhur Olmez e.

**Bernameya vê serdemê wiha ye û kesên wê dersan bidin ev in:**

12’ê kanûnê 2020: M.Şerif Derince, Modelên Perwerdeya Pirzimanî û Rewşa li Tirkiyeyê ji bo Kurdî

12’ê kanûnê 2020: Selda Araz, Analîza Dersên Hilbijartî: Hin Tecrûbe û Pêşniyar ji bo Perwerdeya Zimanê Kurdî

26’ê kanûnê 2020: Şehmus Kurt, Tecrûbeya Enstîtuyên Zimanên Zindî Li Tirkiyeyê: Mînaka Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

2’yê çileyê 2021: Hewa Salam Khalid, Tecrûbeya Perwerdeya Kurdî li Başûr

09’ê çileyê 2021: Nurettin Beltekin, Ji Aliyê Felsefeya Perwerdeyê ve Perwerdeya Kurdî

16’ê çileyê 2021: Ronya Bewran, Analîza Pirtûkên Dersan ên bi Kirmanckî/Zazakî

23’yê çileyê 2021: Ronayî Onen, Hînkirina Zimên wekî Perçeyeke Aktîvîzma Zimên; Tecrûbeya TZPKurdî û Pirtûka Hînkerê. ***AMED***




AKADEMIYA ÎSMAÎL BEŞÎKCÎ
PAYÎZ 2020-2021
(12-19-26 BERFANBAR 2020 / 2-9-16-23 KANÛNA PAŞÎN 2021)

| HEFTE | TARÎX | AXÊVER | DERS |
|---|---|---|---|
| 1. Hefte | 12.12.2020 | M.Şerif Derince | Modelên Perwerdehiya Pirzimanî û Rewşa li Tirkiyeyê ji bo Kurdî |
| 2. Hefte | 19.12.2020 | Selda Araz | Analîza Dersên Hilbijartî: Hin Tecrûbe û Peşnîyar ji bo Perwerdeyîya Zimanê Kurdî |
| 3. Hefte | 26.12.2020 | Şehmus Kurt | Tecrûbeya Enstîtuyên Zimanên Zindî li Tirkiyeyê: Mînaka Zanîngeha Mardîn Artukluyê |
| 4. Hefte | 02.01.2021 | Hewa Salam Khalid | Tecrûbeya Perwerdehiya Kurdî li Başûr |
| 5. Hefte | 09.01.2021 | Nurettin Beltekin | Ji Alîyê Felsefeya Perwerdehî ve Perwerdehîya Kurdî |
| 6. Hefte | 16.01.2021 | Ronya Bewran | Analîza Pirtûkên Dersan ên bi Kirmanckî/Zazakî |
| 7. Hefte | 23.01.2021 | Ronayî Onen | Hînkirina Zimên wekî Perçeyeke Aktîvîzma Zimên; Tecrûbeya TZPKurdî û Pirtûka Hînkerê |

ONLİNE
*Koordînatorê Bernameyê:* ***Cumhur Ölmez***

www.ismailbesikcivakfi.org
ismailbesikcivakfi @ibesikcivakfi
ismailbesikcivakfi @IsmailBesikciVakfi
İSMAİL BEŞİKCİ VAKFI
HAKLARA DESTEK




# Kovareke din li kurdî zêde dibe

Komeke ciwanên kurd amadekariya xwe ya ji bo kovareke wêjeyî dikin. Der barê naveroka vê kovarê de li ser malperên civakî hin agahî ji aliyê komîteya amadekar ve hatin belavkirin.

Li gorî wan agahiyan Kovar dê bi navê HERD’ê û bi 2 zaravayên kurdî (kurmancî û kirmanckî/kirdkî) weşanê bike. Kovar ji çîrok, helbest, werger, rexne û nivîsên teorî pêk tê.

Xebatkarên kovarê jî ciwan û nivîskarên ji her herêma Kurdistanê ne. Tê plankirin ku ev kovar hejmara xwe ya yekemîn di meha adara 2021’ê de bi xwînerên xwe re parve bike.

Komîteya kovara HERD’ê ya weşanê ji van navên li jêr pêk tê:

Gulgeş Deryaspî, Mehsum Reşçelan, Gewher Fetah, Uxur Sermiyan, Bedriye Topaç, Suat Baran, Alî Aydin Çîçek, Omer Barasi û Firat Keklîk. Her wiha li gorî nivîskar Deriyaspî ji ber nexweşiya pandemiyê dê kovar pêşî bi rengekî onlîne were weşandin. Tê payîn ku kovar bi cejna Newrozê re were weşandin. ***AMED***

xwebûn

7-13 Kanûn 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 51

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli

**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Veganîzm ne çi ye?

## Ger mirov veganîzmê tenê bi xwarin û vexwarinê ve sînordar bike wê demê em ê nikaribin aliyên wê yê exlaqî û polîtîk bibînin û dê ji rastiya xwe û ji felsefeya jiyanê dûr bikeve



Gulan Morî*

Di van demên dawîn de, li gelek sohbetan û an jî li hinek deveran em têkildarî têgîna 'veganîzm'ê hinek tiştan dibihîzin û dibin şahidên nîqaşan. Hinek caran jî di medyaya civakî de ev mijar tê guftûgokirin. Ji ber ku ev bihîstinên me seraser in û hinek caran jî di encama nezanînê de bertekên tund tên nîşandan û heta mirov dikare bibêje ku gelek caran bertek vediguherin êrîşan. Gelek kesan ev têgîn bihîstine lê ji ber ku mijar bi awayekî berfireh nehatiye lêkolînkirin, ev têgîn bixwe jî rastî êrîşan tê.

Heta mirov dikare bibêje ku gelek kesên ku dibêjin em vegan in, wekî diyeteke demî lê dinêrin û hinek kes jî wek trend (moda) dibînin û dibin vegan. Ji ber vê yekê li şûna pirsa veganî çi ye, ez dibêjim mirov pirsa veganî ne çi ye bipirse dê baştir be. Mirov dikare mijarê bi van sernavan rêz bike;

Mirov nikare veganîzm wek şêweyeke xwarin û vexwarinê û an jî wek diyetê (perhîz) bibîne. Ger mirov veganîzmê tenê bi xwarin û vexwarinê ve sînordar bike wê demê em ê nikaribin aliyên wê yên exlaqî û polîtîk bibînin û dê ji rastiya xwe û ji felsefeya jiyanê dûr bikevin.

Veganîzm trend nîn e. Di roja me ya îroyîn de lîberalîzmê naveroka hemû têgînan berevajî kiriye û ji wateya xwe ya rast dûr xistiye. Em dibînin ku naveroka têgînên wek; azadî, civakîbûn, edalet, wekhevî, evîn, hezkirin… hatine berevajîkirin û li gorî takekesiyê tên pênasekirin. Çawa ku naveroka van têgînan hatiye berevajîkirin, bi heman awayî dixwazin veganîzmê wek trend bidin nasîn û wekî ku ev têgîn ji asîmanan hatiye nêzîk dibin. Tê zanîn ku hemû tiştên wek moda tên pêşkêşkirin bazareke wan heye û dixwazin ji bo veganîzmê jî bazarekê peyda bikin. Hewl didin vê têgînê ji cewherê felsefeya xwe dûr bixin û wekî heweseke didin nîşandan.

Veganîzm cureyekî vejeteryaniyê nîn e! Her çiqas vejeteryanî xwedî hinek xusûsiyetan be jî di esasê xwe de şêweyekî jiyanê ya goşt nexwarinê ye. Li gorî vê felsefeyê, kesên naxwazin di tebeqa xwe de heywanekî bixwin, dibin vejeteryan û her çiqas wek beşeke veganîzmê xuya bike jî lê di esasê xwe de vejeteryan di pratîkê de bi temamî dev ji îstismarkirina heywanan bernadin! Erê 'goşt' naxwin lê di serî de şîr û gelek berhemên ji heywanan tên çêkirin ên wekî penêr, mast, rûn û hwd. dixwin û bi vî awayî îstismarkirina heywanan didome.

Veganîzm tenê 'hezkirina heywanan' nîn e. Gelek kes xwe wek hezkiriyên heywanan didin nasîn. Heta dema tundî li heywanan were kirin piraniya civakê bi hestên hezkirina heywanan ji vê pêkanînê aciz dibin. Kesên deriyê mala xwe ji heywanan re vedikin, dema li kolanê pisîkeke birçî bibînin ji wan re xwarinê peyda dikin, lext diavêjin ber kevokan lê dema êvarê vedigerin malê li ser sifreyê cesedê heywanekî dixwin. Ev nakokî ye, di hezkirina hewyanan de em durû tevdigerin; em ji hinek heywanan hez dikin û diparêzin, lê hinek heywanan bi awayekî hovane qetil dikin û şerjêkirina wan rewa dikin. Ger kesek xwe wek hezkariyê heywanan bide nasîn û ew kes vegan nebe, feraseta wî/ê ya hezkirinê bi problem e. Ev feraset nîşan dide ku di esasê xwe de ew kes tundiyê dihewînin. Ger kesek pisîkekê bide hembêza xwe û hez bike û dema keriyê pez di ber re derbas bibe û bibêje 'xwezî qelî hebûya me bixwara', ew kes di nezera xwe de tundiya li hemberî hinek heywanan rewa dikin. Rewakirina tundiyê ji heywanan dest pê dike, bi binpêkirina mafê mirovan û zindiyê din ve vediguhere amûreke mêtinkarî û xespkirinê. Carol J. Adams wiha dibêje: "Mêtinkariya li ser heywanan me neçar dihêle ku tundî veguhere norm, rastî û parçeyek ji jiyana rojane." Ev jî nîşan dide ku mêtinkarî mirovan kor dike û bêhelwest dihêle.

Ger mirov pirsgirêkên azadiya mirovan, mafên jinan, mafên mirovan, pirsgirêkên ekolojiyê piştguh bike û serê xwe tenê ji bo heywanan biêşîne, ev veganî nîn e. Yanî ger tu goşt, şîr, mast û hwd nexwî lê li hemberî qetilkirina mirovan bêdeng bimînî ev ne veganî ye. Veganîzm di esasê xwe de li hemberî mafê jiyanê ya hemû zindiyan rêzgirtin e û balê dikişîne ser cewhera mafê jiyanê. Ji ber vê yekê nêzîkatiya mirovahî ya perspektîfa femînîst, ekolojîk û mijarên din serasera nagire dest.

Flora T. Neff pirseke wiha dike: "Em çima nabin reformîstên sêsed û şêst derece? Em çima tenê qadekê wek hobî dijbêrin û qadên din jî bîr dikin?" Bi van pirsan ve li hemberî guhertinê pirsgirêka tabûyan tîne ziman. Veganîzm tiştek hobî nîn e, di hemû qadan de mijareke têkoşînê ye û divê helwesteke exlaqî were nîşandan.

Veganî şêweyeke jiyana dewlemendan hîç nîn e. Di roja me ya îroyîn de veganîzm veguherandine qada bazarê û wekî berhema xwarin û vexwarina dewlemendan didin nişandan, lê xweza ji bo veganan gelek bijarteyên cur bi cur pêşkeş dike. Ev bijarte di tekela komên elît de nîn in. Kesên reklama bazara veganîzmê dikin wisa didin nîşandan ku ger avakado û gûza hindê nebe mirov nikare bibe vegan, lê fasûliyên hişk, savar û li rex wan jî hinek pîvaz gelek pêdiviyên mirov bi cih tînin. Li çiyayên Kurdistanê bi hezaran cureyên pincar û beqliyat hene û ev dikarin mirov têr bikin.

Veganî ew nîn e ku mirov bibêje; "Ez ê ewil cîhaneke ku keda mirovan nayê xwarin ava bikim û piştre bibim vegan." Ev dişibe nêrîna; "Heta serdestiya proleteran pêk neyê, sosyalîzm pêk nayê." Li derdora me gelek kes dibêjin; evqas tiştên girîng diqewimin niha dema nîqaşkirina veganîzmê nîn e, lê veganîzm têkildarî jiyana mirov ve têkildar e û ew kes di tebeqa xwe de çi dixwe girîng e. Kesên guhertinê dixwazin encama têkoşîna wan a bi xwe re ye. Mirov di encama têkoşîneke şexsî de dixwaze biguhere. Ji ber vê yekê ger mirov bibêje bila ewil pirsgirêkên din bên çareserkirin dê piştre dor were veganîzmê, ev tê wateya taloqkirina guhertinê. Ger mirovek guhertina xwe taloq bike û li bendê be dê ev kes bibe femînîst, sosyalîst û ekolojîst û dê vê cîhanê biguherîne ev durûtî ye. Dijîbe durûtiya ku mirov mafê jiyanê yê heywanan biparêze, lê ji hemû cureyên din ên mêtinkariyê çavê xwe bigire.

Veganîzm ew tişt nîn e ku mirov bibêje; "Heywan li Ewropa û Amerîkayê pir tên îstîsmarkirin, li van deran heywan pir rihet in." Dixwazî bila li fabrîqeyan di rojekê de bi milyaran heywan bên şerjêkirin û qetilkirin, dixwazî bila li gund ji bo şerjêkirinê hewyan bên xwedîkirin, di encamê de her du jî îstismar in. Îstismar îstismar e, mirov nikare bibêje ev îstismar biçûk e û an jî mezin e. Çawa ku tundî mezin û an jî biçûk be rastiya ku tundî ye naguhere, ev jî heman tişt e.

Veganîzm nayê wê wateyê ku goşt, penêr, şîr û tiştên din ên heywanan nexwe lê qira pincaran bîne. Gelek kes dipirsin; "Ma canê pincaran jî tune?" Dema vê pirsê dikin wisa difikirin ku kesên vegan li xwezayê qira pincarê tînin. Di esasê xwe de veganîzm bîrdoziya herî radîkal a ekolojîk e. Ji ber vê yekê naxwazin li xwezayê tu zindî tune bibin û koka wan biqele û balê dikişîne ser mafê jiyanê. Nirxandinên wekî, xwarina pincarê û goşt û berhemên din ên heywanan heman tişt in, li gorî min hewldanên sabotekirina veganîzmê ye. Dara sêvê ji bo jinûve fêkiyan bide yên berê diweşîne û mirov jî sêvan ji bo tov û xwarinê berhev dikin. Şibandina xwarina sêvan û goştê berxekê mirov matmayî dihêle. Ger wisa be divê di navbera xwarina berxekê û dergûşa mirovan de tu ferq nebe û ev şibandin bêtir bimantiq e.

**Gelo veganîzm çi ye?**

Her çiqas di sala 1944'an de ji aliyê avakerê The Vegan Societyê Donald Watson ve wek etîmolojîk derketibe holê jî di dîrokê de gelek felsefeyên anîmîstîk li ser vê mijarê serê xwe êşandine û ev têgîn xistine meriyetê û jiyanî kirine.

Ji ber gelek sedeman veganîzm xwarina heywanan, goşt, şîr, mast û gelek berhemên din ên hewyanan red dike. Dema ez vê pênaseyê dikim ji derdora min gelek kes dipirsin; "Gelo vegan mirîşkan jî dixwin?" Dema ez bersiva; "Na nikarin mirîşkan jî bixwin" didim, vê carê jî pirsa; "Ma nikarin masiyan jî bixwin?" dikin. Ji ber ku masî jî zebze nîn e û mixabin kesên vegan nikarin masiyan jî bixwin. Komeke mirovan mezin ku pirsên wek; "Ma nikarin hingiv jî bixwin?" dipirsin hene.

Em dûbare bînin ziman; kesên vegan li dijî zilm û îstismarkirina heywanan derdikevin û ji ber vê yekê goşt, masî, mirîşk, hêk, hingiv û bi kurt û kurmancî hemû berhemên wek penêr, rûn û mast ku ji şîrê heywanan tên bidestxistin naxwin û hemû amûr û kincên ku ji heywanan tên çêkirin li xwe nakin.

Her roj bi milyaran hewyanan ji bo xwarin, kinc, kozmetîk û zewqa mirovan tên qurbankirin. Kapîtalîzmê bi mêtinkariya heywanan ve hemû kozikên sermayeyê bi dest xistine.

Welê kiriye ku gelek kesên qaşo ji xwe re dibêjin zanyar û doktor bi pereyan kiriye û baweriyeke wisa hatiye bicihkirin ku ger goşt û berhemên heywanan neye xwarin mirov nikare bijî. Gelek kes wisa difikirin ku ger goşt nexwin dê kêmaqil bin, ji quwetê bikevin.

Divê neyê jibîrkirin ku em li hemberî pergala kapîtalîst ku her tiştî wek amûrê sermayeyê dibîne û mirovan dike kole têdikoşin û hewl didin pergaleke alternatîf ava bikin. Ger em rola xwe bi cih bînin wê demê em ê karibin li hemberî vê pergala ku zanist û zanyar xistiye bin tekela xwe û hemû parçeyên heywanan pêşkeşî me dike jiyaneke alternatîf ava bikin. Her çiqas gelek çavkaniyên alternatîf hebin jî ji ber ku nayên destekirin populer nîn in.

Çawa ku em bi fikar nêzî hemû tiştên zanist pêşkeşî me dike bi fikar in, lazim e li hemberî hemû hewyanên ku kapîtalîzm pêşkeşî me dike bi fikar bin. Ger wisa nebe em ê rojê sê danan kapîtalîzmê têr bikin.

Moderniteya kapîtalîst bi gelek amûrên xwe ketiye mala me û heta hatiye ser sifreya me jî. Ji ber vê yekê di esasê xwe de veganîzm ew e ku mirov li hemberî her cure tundiyê derkeve û bi awayekî exlaqî heywanên ku canê wan hatiye êşandin û anîne li ber me neyên xwarin. Carol Adams dibêje ku "Di hemû xwarinên bi goşt de tunebûn heye." Dema em xwarinên bigoşt dixwin hinek zindiyan tune dikin. Hafizaya her tiştî heye û bêguman hafizaya qelî, mangal, hamburger û cesedên tên ser sifreya me jî heye. Dixwazim nivîsa xwe bi vê gotina Porphyry bi dawî bikim:

"Gelo çima em dev ji xwarina goşt bernedin û xwe ji gelek nakokiyan rizgar nekin?" Bi hêviya em û nakokiyên xwe li hev nekin…

*** Hiqûqnasa hawirdorê**

